

## ii. dengê heyva...

Dengê heyva li ser golê me îşev gava xwîn diçe ji bejna spîndarê olan e, dipişkive li Payîza demê gava bêjî were li qeracê dayne gava dêwên hesinî biçêrin li peravê..
*Selîm Temo / RÛPEL - 11*



## ...Beşera dilê min delêl

Yek hebû, yek tunebû... ê hebû ne yê me bû, yê tune bû aliyekî me yê winda bû. Ji hebûna me ya li darê dinê, em herdu li wî aliyê winda bûn. Çiqas em nêz dibûn ewqas ji me dûr diket, çiqas me xwe lê digirt ewqas ji me re dibû xerîbek... *Yildiz Çakar / RÛPEL - 5*



## Ferman û koçberî

''Ya şems, ya serê siba ezîz, derge dîwanê Şêx Adî, tu herî hewariya heftê du milletan, hewariya rêwiyên riyan, nefsên tengiyan, serê li ser balgiyan, paşê jî bêyî hewariya me. Ya Melekê Tawis, serê min qurbana te be, tu were hewariya me...'' *Ayhan Erkmen RÛPEL - 8*


Rojnameya Heftane

# xwebûn

www.xwebun.org

23-29 Kanûn 2019
Hejmar: 1
Buha: 4 TL

rojnameyexwebun@gmail.com


## Em bi xwe ne!

Şeva 21'ê kanûnê şeva herî dirêj a salê ye. Piştî vê şevê êdî hikmê tarîtiyê kêm dibe û ronahî li tevahiya rojê serwer dibe. Di nav gelên Rojhilata Navîn de baweriyeke bi navê Şeva Yelda heye. Li hinek deverên Kurdistanê bi boneya vê şevê pîrozbahî tên lidarxistin. Ji bo vê şevê pênaseyên mîtra, mêhrda, mihrza, mîrza tên kirin ango wateya xwe roj hilat e.

Em jî di rojeke wiha de bi belavkirina rojnameya 'Xwebûn'ê silavekê didin xwendevanên xwe. Reh û kokên zimanê me heta bi hezaran salan dirêj dibin. Xêrnexwaz dixwazin rehên me qut bikin da ku em ji xwebûna xwe dûr bikevin. Ji bo em pêşiya xwe baştir bibînin em ji duh, îro û sibeyê di nav hev de dibînin û pêwendiya dem û mekanê ji hev qut nakin.

Xwebûn, xwenasîn û xwezanîn e. Di felsefeyê de xwenasîn bingeha hemû zanebûnan e. Em xwebûna xwe di ziman, çand, erdnîgarî û azadiyê de dibînin.

Îro hebûn û zimanê me desteser kirine û wekî çek li hemberî me bi kar tînin.

Wek rojnameya Xwebûn bêguman çend rêgezên me yên weşanê hene. Ya yekemîn li hemberî pişaftinê parastina zimanê kurdî ye. Rêgezeke din a bingehîn agahdarkirina rast a civakê ye. Her wiha yekitiya neteweyî ku niha di rojeva kurdan de ji bo me jî rêgezeke din e. Em dixwazin hemû kurd xwe di vê rojnameyê de bibînin. Ger di rêya yekitiya neteweyî de hindik be jî roleke vê rojnameyê hebe wê demê em ê karibin bibêjin ku em serfiraz in.

Dibe ku hinek kes meraq bikin û bibêjin gelo ev kî ne? Bersiva kurt û kurmancî; em bi xwe ne!

EDÎTOR

# Heke zimanê te erzan be...



NIVÎSKAR **Rênas Jiyan di hevpeyvîna xwe de bi van hevokan manşeta me temam kir: "Heke zimanê te erzan be, tu û êşên te jî erzan in; çîrok û stran û dîrok û evîn û kêf û helbestên te jî erzan in… Divê ji bo wêjekarekî peyvên zimanê wî pir buha bin, neyên kirîn û firotin." Me der barê wêje û zimanê kurdî de xebat û keda nivîskar û êş û kulên zimanê kurdî de gelek pirs kirin û Rênas Jiyan jî bi comerdî bersiva me da...**

*Hevpeyvîna Rizoyê Xerzî / RÛPEL - 4*

## Armanca me yek e

Piştî hewldanên Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK), li tevahiya Kurdistanê û li Ewropayê kurd ji bo avakirina yekitiya neteweyî û ji bo lidarxistina kongreya neteweyî ku hemû rêxistin û saziyên kurd ên her çar parçeyên Kurdistanê di nav de cih bigirin, ketin tevgerê. Di vê çarçoveyê de li başûr, bakur û rojava û li rojhilatê Kurdistanê, her wiha li Ewropayê nûnerên gelê kurd, sazî, rêxistin, hunermend û rojnameger ji bo yekitiyeke di nav gel de bê avakirin gelek civîn, konferans û daxuyanî dan. Ligel çalakî û hewldanan, nêrînên welatî, nivîskar û siyasetmedaran jî di rojeva wê hefteyê de cihê xwe girtin. Banga yekitiya neteweyî û parastina berjewendiyên niştimanî derket pêş... *RÛPEL / 7*



## Li seranserê cîhanê jin doza mafê xwe dikin

Li Kurdistan, Tirkiye û seranserê cîhanê jin li hemberî tundiyan li kolanan in. Jinan bi çalakiyên xwe banga rêxistinbûna jinan û bilindkirina têkoşînê kirin. Rêxistinên jinan jî bîlançoya tundî û qetilkirina jinan parve kirin. Li gorî van bîlançoyan, di nav 11 mehan de 305 jin ji aliyê mêran ve hatine qetilkirin û 556 jin jî bi tundiyê re rû bi rû mane... *RÛPEL - 2*

## Nasnameyê xopawitişî: Zazacîtî

Meseleyê nasnameyî meseleyêka newe ya û hîna zaf seserr a peyin de însanî pê eleqadar benê. Nasnameyê millî, dînî û cematkî ra tever newe nasnameyî zî vejîyayê. Hetê wiriştiş û rûniştişî ra bîgêrîn hetanî dayiş û girotişî ya însanî wazenê xo pê nasnameyanê neweyan bidê şinasnayiş. Tayî nasnameyî xo ver ra virazîyayê, labelê tayê zî hetê şexsan ra nîyê pêra. Tayê ci rûniştî û miyanê şarî de ca girewto, tayin zî ri nêdî yanî qebûlê şarî nêdîyo yan zî hêdî hêdî bî vîn şî...
*Wisif Zozanî / RÛPEL - 9*

## Helwesta zimanî



Gelo helwesta me ya zimanî çi ye? Di vî warî da ne tenê xwende û rewşenbîr, helwesta hemû beş û tebeqeyên civakê girîng e, ne tenê helwesta pevrayî, helwesta takekesî jî pir girîng e... *Samî Tan / R.5*

## Dîsa û ji nû ve Mem û Zîn



Ehmedê Xanî yek ji wan kesên pêşîn e ku bi êşa parçebûna welatê xwe hesiya. Û bi gotina cenabê wî, wî ji xwe re evîna Mem û Zînê kir hincet da ku kurd tifaqa xwe çêbikin... *Ramazan Olçen / R.5*

## Kremlîn vala hat derxistin



Di 19'ê kanûnê de li Rûsyayê du bûyerên mezin pêk hatin. Her çiqas mijar û şêwaz ji hev cuda bin jî ji ber bandora wan a li ser hev bi awayekî yekser ketin rojeva siyasî ya Rûsyayê... *Felemez Ulug / R.7*

## Di demên cîyawaz de…



Merheba xwînerên delal, bi boneya nivîsandina ji rojnameya Xwebûnê, ez jî bi kel û bîn vegeriyam salên xwe yên 'nirxandin' û 'rexnegirî'yê ku piraniya wan ji gotar û nivîsarên min... *Şener Ozmen /R.11*

## Warê ku dîrok jê dizê



Girêmiraza, mejiyê mirovan bi pirsên bê bersiv dagirtiye. Herkes ji hevdu dipirse û pirsên xwe bi pirseke din dibersivîne. Bi vî awayî her ku diçe pirs mezintir dibe, lê bersiv zîro... *Agît Yazar / R.12*

330x500 rupel 2+++:Layout 1 21.12.2019 14:56 Page 1 (Black/Black plate)



# Jin bê tirs û bi hêz li qadan bûn

Jinên çar parçeyên Kurdistanê û hemû cîhanê vê salê li dijî her cureyên tundiyê li qadan bûn. Bi taybetî jin bi çalakiyên xwe yên bi reqs banga rêxistinbûyîn û bilindkirina têkoşînê kir

NAVENDA NÛÇEYAN




Têkoşîn û çalakiya jinên cîhanê ku di meha mijdarê de bênavber berdewam kirin û di 25'ê Mijdarê Roja Têkoşîna Tundiya Li dijî Jinan gihişt asteke bilind, di meha kanûnê de jî berdewam kirin. Ji Kurdistanê heta Tirkiyeyê, ji Iraqê bigire heta Îran û Şîliyê jin li dijî her cureyên tundiyê li qadan, tevî hemû astengiyan jî li ber xwe dan û bê tirs çalakiyên xwe pêk anîn. Jin bi çalakiyên xwe yên cur bi cur peyama 'tu êrîş û hêz nikare têkoşîna jinên birêxistinkirî têk bibe' dan.

Bi taybetî li dijî qetilkirin, tundî, îstîsmar û tecawizê, çalakiya bi dansa a jinên Şîliyê ku di 25'ê Mijdarê de li ber Wezareta Wekheviya Zayenda Civakî û Mafên Jinan pêk anîbûn û ev çalakî li cîhanê bûbû rojev, di meha kanûnê de jî bandora xwe da hîskirin û berdewam kir. Li gelek welatan jin bi heman çalakiyê li dijî qetilkirin, tundî û tecawizan bertekên xwe anîn ziman.

Li Kurdistanê jî jin piştî çalakiyên 25'ê Mijdarê, di meha kanûnê de bi çalakiyên wek semîner, civîn, şahî, meş, daxuyaniyan û hwd. li dijî tundiyê bertekên xwe anîn ziman. Her wiha jinên kurd di qada zimanê kurdî de jî çalakî pêk anîn. Jinên kurd li dijî asîmîlasyona li ser ziman, ji bo kurdî di her qada jiyanê de bibe zimanê rojane û pêş bikeve, çalakiyan pêk anîn û platforman ava kirin. Jinên kurd dixwazin bi rêya van çalakî, platform û civînan di nav civakê de hestiyariyek bidin avakirin.

Jinên li Tirkiyeyê jî bi reqsa jinên Şîliyê bertek nîşanî tundiyê dan û ketin rojava jinên Tirkiyeyî.

Derveyî çalakiyên jinan ên li dijî her cureyên tundiyê gelek bûyerên ku azadiya jinan û destkeftiyên wan kirin hedef jî hatin jiyîn. Mînak; di 4'ê kanûnê de Desteya Bilind a Fedwa ya girêdayî Yekitiya Alimên Îslamî ya Herêma Kurdistanê bi îdiaya ku karên ne li rê û ne ehlaqî rû didin fetwayeke sosret derbarê jinan de da. Li gorî fetwayê nabe jin bi tenê bigerin, derkevin derveyî bajêr û bi tenê li taksiyê siwar bibin. Ji aliyê din ve jî çalakiya bi dansê ya jinên tirkiyeyî ji aliyê Wezîrê Karên Hundir Suleyman Soylu ve hat rexnekirin û hwd.

Her wiha gelek sazî û rêxistinên jinan jî bîlançoya tundî û qetilkirina jinan parve kirin. Li gorî vê bîlançoyê di nav 11 mehan de 305 jin ji aliyê mêran ve hatine qetilkirin û 556 jin jî bi tundiyê re rû bi rû mane. Lê li gorî bîlançoya ne fermî hejmar hîn zêdetir e.

***Bûyer û çalakiyên ku pêk hatin wiha ne:***

✓ Li bakurê Kurdistanê jin di çarçoveya kampanyaya 6 mehan a Tevgera Jinên Azad (TJA) ku bi dirûşma 'Ji bo guhertin û azadiyê tu jî rabe ser pêyan' dabûn destpêkirin, çalakiyên xwe domandin. Kampanyaya ku dê di dawiya meha kanûnê de bi dawî bibe, bi awayekî cuda bê domandin.

✓ Meclisa Jinên a HDP'ê civîn û kongreyên xwe pêk anîn. Di van civîn û kongreyan de biryara bilindkirina têkoşînê hatin girtin.

✓ Komîsyona Jinan a Kongreya Civaka Demokratîk (KCD) di 3'yê mijdara 2019'an de bi şiara 'Deng û Pênûsa Azad Jina Têkoşer a Nemir e' bi tevlibûna gelek jinên helbestvan, nivîskar, çîroknûs, senarîst, edîtor, aktîvîstên TJA, nûnerên sazî, partî û jinên siyasetmedar di komxebata 'Jin Nivîs û Nivîskariyê' li dar xist. Piştî nîqaşan û girtina biryarên girîng 'Platforma Pênûsa Jinên Mezopotamyayê' hat avakirin.

✓ Li rojavayê Kurdistanê li dijî qetilkirina jinan û tundiyê gelek semîner, civîn, meş û hwd. pêk hatin. Jin bi çalakiyên cur bi cur bal kişandin ser tundiyê û têkoşînên ku li dijî tundiyê tên dayîn.

✓ Li başûrê Kurdistanê rêxistinên jinan bernameya 16 rojan ku starta wê di 25'ê Mijdarê de hatibû dayîn, bi çalakî û şahiyên cur bi cur bi dawî kirin. Gelemperiya çalakiyên li Başûr ji bo piştgirîdayîna mafên jinên Rojava pêk hatin. Piştî bidawîbûna bernameya 16 rojan sazî û rêxistinên jinan daxuyaniyeke hevpar dan.

✓ Di 4'ê kanûna 2019'an de Desteya Bilind a Fedwa ya girêdayî Yekitiya Alimên Îslamî ya Herêma Kurdistanê bi îdiaya ku karên ne li rê û ne ehlaqî rû didin fetwayeke sosret a ji 8 xalan pêk dihat derbarê jinan de da. Li gorî fetwayê nabe jin bi tenê bigerin, derkevin derveyî bajêr û bi tenê li taksiyê siwar bibin. Ev fetwa rastî bertekên jinên Başûr hatin. Jin li dijî vê fetwayê çalakî pêk anîn û ji Desteya Bilind a Fetwayê xwestin ku biryaran paşve vekişînin û lêborîn bixwaze.

✓ Li Tirkiyeyê gelek jin ji aliyê mêran ve hatin qetilkirin û rastî tundiyê hatin. Sazî û rêxistinên jinan li dijî van bûyeran çalakiyan pêk anîn. Heta jinên tirkiyeyî çalakiya bi reqs pêk anîn û ev çalakî jinan rastî nerazîbûna Wezîrê Karên Hundir hat. Piştî nerazîbûna wezîr li gelek bajarên Tirkiyeyê jin bi heman çalakiyê bertekên xwe anîn ziman. Her wiha jinên parlamenter ên CHP'ê jî li meclisê bi heman rengî bertek nîşanî wezîrê hundir dan. Ji aliyê din ve jin dozên tundiya li ser jinan şopandin û li dijî yasaya nafaqayê jî çalakiyan pêk anîn. Her wiha jinên li Tirkiyeyê ji bo naskirina nasnameya xwe di 15'ê kanûnê de ji bo 17 hefteyan atolyeya jineolojiyê dan destpêkirin û dê atolyeya jinan di sala nû de jî bidome.

✓ Jin li Iraq û Îranê jî li dijî tundiyê çalakiyan pêk anîn. Heta li van welatan jin ji çalakiyên civakî re jî pêşengtiyê kirin.

✓ Di serî de jinên Şîliyê jinên çar aliyên cîhanê jî li dijî her cureyên tundiyê daketin qadan û gotinên xwe anîn ziman.

## Serhatî û sîren?

*Mizgîn Ronak*

"Ji James Joyce û vir ve em dizanin ku mezintirîn serhatiya jiyana me, kêmasiya serhatiyan e. Ulyssesê ku li Troyê şer kiriye, piştî ku behrê derbas kirine vegeriyaye mala xwe, wî xwe bi xwe keştiya xwe ajotibû berpirsyarê wê bû û li ser her giravê jî xwedan destikek bû, na bêguman ew ne awayê ku em jiyana xwe pê dijîn. Axir rêwîtiya Homeros êdî di hundirê me de ye… Girav, behr, sîrenên ku hiş û aqil ji serê me dibin û Îthakaya ku gazî me dike. Van rojan ew êdî tenê dengê hebûna me ya hundirîn in." (Mîlan Kundera, "Pirtûka Ken û Jibîrkirinê," Kovara Zarema rexne û teorî, payîz-2014.) Em di serî de dest pê bikin; tesbîta ku dibêje "mezintirîn serhatiya jiyana me, kêmasiya serhatiyan e" ma kêmasiya serhatiyan dikare bibe 'serhatî'?

Belê. Em jin vê serhatiya ku bi giranî, sînor û şikestinên xwe dibe "serhatiya" herî dilşewat û "ne serhatî" baş dizanin. Lew serhatiyên me nîn in. Em di helwestên xwe yên herî têkoşer de jî kedîkirî ne, dema ku em dixwazin zîrek û jêhatî bibin jî em dişibin mêran! Lew çavên me yên bêserhatî, ji bilî serhatiya mêran a dewletokî tu serhatiyek azad û baskbilind nedîtine. Loma jî hem em, hem dîrok, hem jî roja me, deyndar in. Deyndarên li hemberî jinê. Lê em çawa li hemberî xwe deyndar in? Lewra piştî demekê em hemû bûn masiyên li nav masîdankê (akvaryum) û me oqyanûs jî bîr kir. Di her hest, peyv û helwesta me de masiyên masîdankê hene ne yên sewdaser û azad ên li oqyanûsan û serhatiyên bê ser û bêr.

Ji ber vê yekê em ne Ulysses (Udysseys) in ne jî keştî, serhatî û vegera me ya efsanewî heye. Lê belê em disa jî rêwî ne, waye diyar e ku em ê jî tevî çolsehra û deryayan derbas bibin, bi ba û bahozan re bibin dost û rastî sîrenan jî bên! Îja çi! Ji bo ku şukur em ne mêr-ne Ulysses in, sîren xwişkên me ne, hemû cin û periyên deryayî, wan lehengên jin jî…

Loma em bi şans in, dê ev keştî li tu derê asê nemîne û em neçar nemînin guhên xwe bi şimayan bixitimînin û xwe ker bikin da ku dengê sîrenan neyê me. Tew em bi xwe sîren in jî. Tevî hêza xweza û kulîlkan, a bahoz, zanîn, hestiyarî, serhatî, wêrekî û firtoneyan bi me re ye. Star jî, Îştar, Înanna, Vesta, Kleopatra, Mestûrexana Erdelanî, Feyrûz, Adîlexan, Besê, Zîlan û Arîn jî bi me re ne. Bes em qefesên kedîkirinê bişkînin û firtoneya dil û mêjiyê xwe rakin. Lew "tenê dengê hebûna me ya hundirîn" ku nivîskar dibêje ji Ulysses maye têra me nake. Em bi xwe rê, rêwîtî, serpêhatî û tevger in. Nema disekinin...



# Eyşe Şan bi deng û stranên xwe bû nemir

NAVENDA NÛÇEYAN

Gelek jinên kurd bi têkoşîn û serîrakirinên xwe yên li dijî paşverûtiyên civakî navên xwe li rûpelên dîrokê nivîsandin. Yek ji van jinan ku bi stranên xwe navê xwe li dîrokê nivîsandin û wek 'keybanûya bêtac' tê nasîn Eyşe Şan e.

Eyşe Şan di sala 1938'an de li Amedê ji dayik bû. Ji ber bavê wê dengbêj bû nasîna wê ya muzîkê di temenkî biçûk de çêdibe.

Eyşe Şan a ku li cemaetên jinan bi qesîdeyan dest bi jiyana xwe ya muzîkê kir, wek Eyşe Şan, Eyşana Kurd, Eyşe Xan, Eyşana Elî dihat nasîn. Eyşe Şanê stranên wekî 'Qederê', 'Dayikê' zêde kir, ji ber feraseta civakê ya 'guneh' bûna strîna stranan, rastî gelek pêkutî û çewisandinan hat û ji ber vê ji Amedê vediqete û ji neçarî li Dîlokê bi cih dibe.

**Strana 'Ez Xezal im'**

Eyşe Şan a li Dîlokê dest bi jiyana xwe ya hunerî kir, lê ji ber qedexebûna zimanê kurdî, li radyoya ku lê dixebitî ji neçarî 2 salan bi tirkî distrê. Di sala 1963'an de berê xwe dide Stenbolê û li wir bi strana xwe ya "Ez Xezal im" navdar dibe û bi derxistina kaseteke kurdî-tirkî êdî tê naskirin. Di heman salan de Eyşe Şan ji ber zextên li ser zimanê kurdî berê xwe dide Almanyayê.

**Berê xwe dide Başûr**

Piştî demekê Eyşe Şan di sala 1972'an de diçe Almanyayê û li bajarê Munsenê bi cih dibe. Li wir keça wê Şehnaz jiyana xwe ji dest dide. Piştî vê bûyerê Eyşe Şan demeke dirêj dev ji xebatên hunerî berdide. Ji Almanyayê vedigere welêt. Lê vê carê ji ber zextên malbatê di sala 1979'an de derbasî başûrê Kurdistanê dibe. Li Duhok, Kerkûk, Hewlêr û Bexdayê bi hunermendên mîna M. Arifê Cizîrî, Îsa Berwarî, Gulbihar, Tahsîn Teha, Nesrîn Şêrwan û hwd. re derdikeve ser dikê û stranan dibêje.

Eyşe Şan ku hemû êş û janan gelê xwe bi stranan dianî ziman, di 18'ê kanûna 1996'an de ji ber nexweşiya pençeşêrê jiyana xwe ji dest dide û li pey xwe gelek stranên bi êş û keser dihêle.

Di roja me ya îro de jî stranên keybanûya bêtac ji aliyê gelê kurd ve bi taybetî ji aliyê jinên kurd ve tê guhdarkirin.

330x500 rupel 3 nuuuuu+:Layout 1 21.12.2019 15:33 Page 1 (Black/Black plate)



# Zilma li ser sînorên sê dewletan

**Bi hevkariya Îran, Ermenistan û Tirkiyeyê Rojnameger Azîz Orûç hat girtin. Rojnamegerên kurd li Orûç xwedî derketin û parastina rojnamegeriya rasteqîn kirin**

Qedrî Esen

Rojnamegerekî din li rojnamegerên girtî zêde bû. Lê ev zêdebûn ji zêdebûnên beriya niha cudatir bû. Ji ber ku bi hevkariya 3 dewletan pêk hat. Belê ez qala radestkirina Rojnameger Azîz Orûç dikim. Orûç piştî ku bi salan li bakurê Kurdistanê rojnamegerî kir, di sala 2017' an de ji ber dozeke wî ya dema zanîngehê ceza li hat birîn û neçar ma derbasî başûrê Kurdistanê bû. Li vir jî ji 2 salan zêdetir nûçe çêkirin û ji bo televîzyonan berneme amade kirin.

Herî dawî di 8'ê kanûnê de ji bo ku derbasî Ewropayê bibe ji bajarê Silêmaniyê derbasî Îranê bû. Dema ku xwest ji vir jî derbasî Ermenistanê bibe, ji aliyê Hêzên Ewlehiya Sînor ên Ermenistanê ve hat desteserkirin. Piştî lêpirsînek kûr û işkenceyeke giran radestî îstixbarata Îranê hate kirin. Li gel ku bêpirsgirêk ji Îranê derbasî Ermenistanê bûbû jî, li ser radestkirina Ermenistanê, ji bo Îranê ku di îşkencekirin û darvekirina kurdan de xwedî azmûn e, bû pirsgirêrekek mezin. Orûç ji aliyê îstixbarata Îranê ve jî di lêpirsîneke kûr de hat derbaskirin û piştre cezayê pere û dersînorkirinê lê hat birîn.

**Peywira xwe pêk anîn!**

Îstixbarata Îranê, li hemberî Orûç dijmirovane tevgeriya û li şûna ku wî di deriyê sînor re radestî Tirkiyeyê bike, di ser têlan de ew avêtin sînorê Tirkiyeyê û terkî mirinê kir. Bi vî awayî Îran û Ermenistanê peywira xwe ya dewletbûnê ya ji sincê mirovahiyê dûr pêk anîn û peywir dewrê Tirkiyeyê kirin. Tirkiye ku di hêla dûrbûna ji sincê mirovahiyê de ji Ermenistan û Îranê pêşdetir e, di vê mijarê de peywira ket ser milê wê pêk anî.




Destpêkê li ser agahîdayîna îstixbarata Îranê, Orûç û kesên ku wî ji mirinê rizgar kirin binçav kirin û ji raya giştî re Orûç weke 'terorîst' ragihand. Li gel şahidî û bi dehan delîlên rojnamegeriyê jî Tirkiyeyê Orûç û kesên wî ji mirinê rizgar kiribûn girt û şandin zindanê.

**Dikare bimire lê nikare bireve**

Di van rojên ku gelek plan û lîstikên gemarî li ser xaka kurdan tên kirin de dewletên li ser xaka kurdan desthilatdar in û dewletên cîranê wan li gel hemû dijberbûna xwe jî di mijara kurdan de dest didin hev û li dijî kurdan hevkariyê dikin. Di mînaka Orûç de jî careke din derket holê ku tu ne gerîla û şervan, rojnamegerekî kurd bî jî para xwe ji vê hevkariya dijberbûna kurd digirî û li gorî pêwîstiyê têyî cezakirin. Ji ber kurdbûna xwe Orûç, bi vê aqûbetê re rû bi rû ma. Heke Orûç ne kurdbûna ji neteweyeke din bûna îhtimaleke mezin ev tişt nehatina serê wî.

Dewletên ku niha li ser radestkirina bi ewle ya terorîstên DAÎŞ'ê hevdîtinan dikin û ketine etriya canê wan, rojnamegerê kurd Orûç li ser sînor terkî mirinê kirin. Li gorî wan Orûç dikare bimire lê nikare ji zilma wan bireve. Tişta ji bo kurdan û rojnamegerên wan rewa tê dîtin ev e. Lê divê bê zanîn ku bi vê yekê re rojnamgerî jî tê qetilkirin.

**Parastina rojnamegeriyê kirin**

Tişta mirov dişîne û divê li ser bê rawestandin jî nêzikbûna sazî û dezgehên çapemeniyê ya li hemberî vê qetilkirina rojnamegeriyê ya bi destê dewletan e. Roja ku Orûç ji aliyê Wezareta Karên Hundir ve weke terorîst hat lansekirin, li Tirkiyeyê bi dehan sazî û dezgehên çapemeniyê Orûç weke 'terorîst' nîşan dan. Bi vê nêzîkbûna xwe piştgirî dan qetilbûna rojnamegeriyê ya bi destê dewletê.

Bi binçavkirin û girtina Orûç careke din derket holê ku rojnamegerên kurd, li Tirkiyeyê, ji bo parastina rojnamegeriyê bedelên mezin didin. Lewre ji bo vê yekê rojnamegerên kurd li Orûç xwedî derketin û bi xwedîderketina Orûç re parastina rojnamegeriya rasteqîn kirin.

Heke li gorî rêgezên dewletan rojnamegerî bê kirin û rojnameger dernekevin derveyî van sînoran wê gelek rastî di tariyê de bimînin û ser wan bê girtin.

## Li ser milkên êzidiyan rûniştine û nadin wan

Welatiyên êzidî yên ji gundê Kelhokê yê girêdayî navçeya Qûbînê ya Êlihê, di sala 1992'yan de gund û erdên xwe radestî malbata Karabûlût û Bîter ên endamên eşîra Reşkotan kirin û ji warê xwe koçî Ewropayê kirin. Êzidîyan di hizûra noter de bi îmzekirina belgeyan erd û gundên xwe bi 'emanetî' radestî van her du malbatan kirine. Êzidî piştî 20 salan ango di sala 2012'an de vegeriyan û xwestin erd û gundên xwe yên radestî her du malbatan kiribûn paş de bigirin.

**Êrîşî êzidiyan kirin**

Welatiyên êzidî ku xwediyê gund in her çiqas doza erd û gundên xwe kirin jî lê endamên malbata Karabûlût û Bîter mal û milkê wan nedan. Li ser vê yekê malbatên êzidî li 2'yemîn Dadgeha Asliye ya Hiqûqê ya Êlihê doz vekirin. Piştî salan di têkoşîna hiqûqî de êzidî bi ser ketin û bi biryara dadgehê hat xwestin ku endamên eşîrê erdên êzidiyan li wan bizivirînin.

Piştî biryara dadgehê malbatên êzidî ku xwestin erdên xwe cot bikin, bi tundî û gefên malbata Karabûlût û Bîter re rû bi rû man.

Herî dawî ferdên her du eşîran nehiştin êzidî erdên xwe bajon û li navenda Êlihê êrîşî wan kirin. Di encama êrîşê de ji malbatên êzidî Nedîm Erkîş û Cevdet Tûkû di êrîşê de birîndar bûn. Êzidî piştî êrîşa li hemberî xwe bi 3 traktoran çûn gundên xwe û bi tevlîbûna 300 leşkeran erdên xwe rakirin.

**Ûca êrîş bir rojeva Meclisê**

Parlamentera HDP'ê ya Êlihê ya êzidî Feleknaz Ûca, bertek nîşanî êrîşa li ser welatiyên êzidî da û bi pêşnûmepirsekê rewşa wan bir rojeva Meclisê. Ûca di pêşnûmepirsa xwe de bi daxwaza bersivandina Alîkarê Serokkomar Fûat Oktay têkildarî êrîşê pirs kirin. *ÊLIH*

## Kevirên sûrên Amedê tên dizîn

Navçeya Sûrê ya Amedê ku navê xwe ji sûrên xwe digire, tê texrîbkirin. Li navçeyê, beriya 4 salan di 2'yê kanûna 2015'an de qedexeya derketina derve îlan bû û heta bihara sala 2016'an ev qedexe berdewam kir. Li 6 taxên navçeyê hê jî qedexe didome. Bi van qedexeyan re şerekî dijwar li navçeyê pêk hat. Ji ber vî şerê dijwar xesareke mezin gihîşt berhemên dîrokî yên li navçeyê. Li gorî raporeke Yekitiya Odeyên Avahîsaz û Endezyarên Tirk (TMMOB), li 6 taxên navçeyê 87 avahiyên tescîlkirî jî di nav de bi giştî 4 hezar û 985 avahiyên dîrokî hatine rûxandin.

Li Sûrê rewş bi vê tenê re ne bi sînor e. Di nav hefteyê de nûçegîhanê Ajansa Mezopotamyayê Lezgîn Akdenîz bi nûçeyekê derxist holê ku kevirên sûrê tên dizîn û firotin. Li gorî nûçeya Akdenîz, sûrên ku hin derdorên wan ji ber bêxweditîyê hindik mane hilweşin, li hêla Deriyê Mêrdînê hin kevirên sûran hatine rakirin. Hin kevirên li ser wan wêne hene jî ji cihê xwe hatine leqandin.

**Li ber Dîcleyê difiroşin**

Selîm Çanak ku çayxaneya wî nêzî sûran e, got ku bi şev gelek kes tên ber sûran, lê belê gava dibe bi roj kevir ne li cihên xwe ne. Çanak, destnîşan kir ku ji zû de kevirên sûran tên dizîn lê belê niha jî kevirên li ser wan şikil û remz hene hatine derxistin. Tê gotin ku di bin kontrola polîsan de bi qamyonan kevir hatine kişandin û li hêla Deriyê Mêrdînê li qeraxê çemê Dîcleyê hatine valakirin. Qamyona van keviran bi 8 hezar TL'yî tê firotin. Qamyona kevirên bijartî jî bi 15 hezar TL'yî tê firotin.

Avahîsaz Arîf Îpek jî têkildarî mijarê got ku di demên dawî de li kafeyên Sûrê ev kevir tên bikaranîn û li hin cihan jî ji bo dekorasyona hundir wan bi kar tînin. Îpek, destnîşan kir ku heke tevdîr neyên girtin wê ev texrîbat zêdetir bibe û ev tişt got: "Divê derbarê firotina van keviran de cezayên giran bên dayîn. Divê saziyên berpirsiyar rojek berî rojekê tev bigerin."

**Tu agahî neda**

Li gel ku ev dizîn di bin kontorala polîsên dewletê de hatiye kirin jî walîtiya Amedê, piştî derketina rewşê bi çend rojan daxuyaniyek da û angaşt kir ku kesên ku kevirên sûrê didizin û difiroşin binçav kirine. Lê balkêş e di daxuyaniyê de têkildarî nasnameya van kesan de tu agahî nehat dayîn û her wiha nehat aşkerakirin ku çend kes hatine binçavkirin.

Parlamenterên HDP'ê yên Amedê Dersim Dag û Semra Guzel, dizîn û firotina kevirên sûrê Amedê bi pêşnûmepirsan birin rojeva meclisê. Her du parlamenteran ji wezîrên berpiryar pirsan kirin û xwestin ku hîn bibin der barê kesên keviran dizîne de lêpirsîn hatiye destpêkirin an na. *AMED*



## Ji Partiya Vatanê daxwazên sosret



NAVENDA NÛÇEYAN

Partiya Vatanê, di nav hefteyê de ji bo rakirina nav, peyker û remzên serokên kurd Şêx Seîd û Seyît Riza ku ji aliyê dewletê ve di demên cuda de hatine darvekirin, serî li walîtî û şaredariyên Amed û Dersimê da. Partiyê di serlêdana xwe de xwest ku navên her du serokên kurd li her du bajaran li kuçe û kolanan hatine danîn bên guhertin û peyker û remzên wan bên rakirin. Dîsa di serlêdanan de her du serok jî weke 'xayînên welat' hatin pênasekirin.

**Seyît Riza bîra Dersimê ye**

Vê hewldana Partiya Vatanê li her du bajaran jî rastî bertekên tund hat. Li Dersimê gelek partî, sazî û dezgehên elewiyan bi daxuyaniyên cuda bertek nîşanî Partiya Vatanê dan. Diyar kirin ku Seyîd Riza bîra gelê Dersimê ye û tişta ku tê armanckirin bêbîrhiştina civakê ye. Her wiha anîn ziman ku Partiya Vatanê dixwaze bi vê serlêdanê ser rastiya komkujiya Dersimê binixumîne.

**Dê serlêdana sûc bikin**

Li Amedê jî Komeleya Şêx Seîd, bi daxuyaniyekê bertek nîşanî van serlênan da. Serokê Komeleya Şêx Seîd Kasim Firat, diyar kir ku Partiya Vatanê dixwaze kuştin û qetilkirina kurdan bê berdewamkirin û wiha got: "Kesên ku ziman û hebûna kurdan qebûl nakin, bila zanibin ku em ê dev ji ziman û nirxên xwe bernedin." Firat da zanîn ku ji bo Serokê Giştî yê Partiya Vatanê Dogû Perînçek dê serlêdana sûç bikin.

330x500 rupel 4+++:Layout 1 21.12.2019 14:38 Page 1 (Black/Black plate)



## WÊJE JI DÊVLA KU NEHEQIYA LI CIVAKA XWE AŞKERA BIKE VEDIŞÊRE

# Wêjeya kurdî veşartokek e

→ RIZOYÊ XERZÎ

Di sînemegerê fransî Godard de kameraya nîşanker carna ne ji bo ku nîşan bide, tam dijberê wê ji bo ku "veşêre" tê bikaranîn: Heke bûyer an jî neheqiyek hebe û tu berê kamerayê bidî giya û kulîlkan, tu bi alava kamerayê wê neheqiyê vedişêrî

*Me der barê wêje û zimanê kurdî de xebat û keda nivîskar û êş û kulên zimanê kurdî de gelek pirs kirin û Rênas Jiyan jî bi comerdî bersiva me da. Fermo em bi hevre li xemxurekî zimanê kurdî guhdar bikin.*

***Rêzdar Rênas Jiyan, tu dikarî behsa çîroka xwe ya destpêka helbestvaniyê bikî, Rênas çawa dest û çima dest bi nivîsîna helbestê kir û çima helbest û ne beşeke din a edebiyatê?***

Her çend ez niha zêde serê xwe bi pexşanê û bi romanan re biêşînim jî, min bi helbestê dest bi kurdî kir; ji ber ku helbest "av" e. Mirov berê avê vedixwe, û dişitile. Heke min helbest nenivîsanda ez ê bişeniqiyama, bifetisiyama. Ez niha jî tî bûme û li ser pirtûkeke helbestê dixebitim.

***Helbest bo we tê çi wateyê ?***

Giyanê mirov bi helbestê paqij dibe, helbest ji bo min behra paqijiyê ye, terapî ye ku ez xwe pê bikewînim, çiya ye ku ez derkevim li ser biqîrim, stêrkeke ku ez lê tenê bimînim…

***Ji bo we kurdên ku çîrok, roman û helbestên xwe bi zimanekî din dinivîsin ew berhem dibin malê pirtûkxane û mîrateya çanda kurd an dibin malê wî zimanê pê hatiye nivîsandin, çi feydeya wan berheman ji bo kurdan heye?***

Çawa em nikarin ji berhemên bi fransî, îngilîzî û almanî re bêjin ev aydî kurdî ne; kurdan nivîsandibe ya jî nenivîsandibe, em nikarin ji pirtûkên bi tirkî, erebî û farisî re jî bêjin ev aydî kurdî ne. Gerek mirov nebe palê pûş û xwe nexapîne. Gava mala mirov bişewite, gerek mirov neçe xaniyê xelkê boyax neke, xweşik neke. Heke destê wan pir jê nabe, dikarin bi her du zimanan jî binivîsin, ew jî riyek e. Ku her kesî bi zimanekî din binivîsanda îcar wê kê bi kurdî binivîsanda?!

Lê di vir de ferqek heye, netewetî û gerdûnî: Heke berhemek bi awayê neteweyî nebe aydî mirov jî, bi awayê gerdûnî dikare bibe aydî wî. Lê divê berhema ku bi zimanekî din hatibe nivîsandin di asta "cîhanî" de be û pir pir mezin be. Harper Lee û romana wê "Kuştina Bilbilan" berê ya Amerîka û dûre jî ya kurdan e.

Mirov dikare alavên serdestan bi kar bîne, lê divê bikaranîna wan alavan ji bo têkbirina serdestiyê be, ne ji bo ku mirov pê bindestan bikuje û bide pey berjewendiyên şexsî û populîzmê.

Di vir de divê nivîskarên kurdî jî hay ji xwe hebin û ji ber ku bi kurdî nivîsandine xwe ji her tiştî neşon û quretiyan li ser serê xelkê nekin. Divê nebêjin: "Ê jixwe wa ye me bi kurdî nivîsand û temam! Bû-nebû tişt pê nayê." Tişt pê tê. Nivîsandina nebaş a bi kurdî jî zerarê dide kurdî.

Kurdên ku bi tirkî dinivîsin, heger qabiliyet û hunera xwe layiqî kurdî nebînin, ji etîk û duristiyê dûr in; her wiha îcar kurdên ku bi kurdî dinivîsin û hemû qusûrên xwe bi nivîsandina kurdî vedişêrin jî ne durist in.

***Li gorî Lacan; divê ku fantazî û daxwazên mirovî bi qasî ku mirov nikaribe wan bi dest bixe jî rastiya mirovê ku dixwaze wêdetir be. Û dibêje; dema tu tişta dixwazî bi dest bixî, êdî tu wê naxwazî. Yanî mirov ne ji bidestxistinê lê ji xeyala wê hez dike. Ji bo ku ew xeyal jî tim zindî bimîne lazim e tim ji me kêm be. Gera di nav labîrenta edebiyatê de jî fantaziyên nivîskar e. Denklemeke qeba bû lê dîsa jî heke denklem ev be ji Janyayê heta bi Stranên Sor Nivîştên Mor; ji bo Rênas Jiyan fantaziya li dû ye çi ye, ew li pey xeyala kîjan rastiyê ye?***

Xeyala min azadî ye, mixabin ez negihame azadiyê. Pirtûkên min xeyalên min in, ango lêgerînên min ên azadiyê ne. Azadiyeke teqez (mutleq) tune ye, ji ber wê jî ti carî xeyala azadiyê naqede. Bi nivîsandina her pirtûkê ez gaveke din nêzîkî azadiyê dibim lê nagihêmê. Xeyal xweş in lê divê ew hindik hindik karibin bibin bireser ku rêveçûna xeyalbîn (ê ku xeyalan dibîne) bidome. Xeyalên beravêtî kuştina xeyalbîn e. Xeyaleke bidestxistî rê li ber gelek xeyalên din vedike: Mirov çer ku digihêje xeyala xwe, ew xeyal di destê wî de diteqe û dibe bi milyonan xeyal. Pirtûkên min ên xeyalî (projeyên min) sed qatî ji pirtûkên min ên weşiyayî pirtir in; yanî ez pir kêm im. Ez ji Lacan hez dikim. (Ez dizanim ku ev bersiva min jî "kêm" bû, dîsa Lacan mafdar e.)

***Helbet çeka herî xurt a edebiyatê û pê re ya hişî ziman e. Ma ne li gorî psîkanalîstên strukturalîst ziman; di heman demê de civakîbûn, çand û dîrokê tevî qanûn û qedexeyên wê civakê di nav xwe de dihewîne. Zarokekî dema çavê xwe li vê cîhana nenas vedike hêj ku wateyeke nikare bide tiştekî xwe di nav deryaya sembolên ziman de dibîne. Îcar ji bo gelekî weke gelê kurd ku di şikenceya pişaftinê de ye, rol û rista wêjekar û têkiliya wî/wê bi ziman re divê çawa be?***

Ji ber ku civaka me ne civakeke hişmend e pir zû di zimanê xwe de dibihure. Em bi çavê "xurde"yan li bêjeyên zimanê xwe dinêrin ku gişî bi erebîbazar bifiroşin etaran. Heke zimanê te erzan be, tu û êşên te jî erzan in; çîrok û stran û dîrok û evîn û kêf û helbestên te jî erzan in… Divê ji bo wêjekarekî peyvên zimanê wî pir buha bin, neyên kirîn û firotin: Ew wan yek bi yek ji kuçe û ser sergoyan bide hev, bi ruhê xwe wan xwedî bike, di dilê xwe de wan germ bike û bîne deyne pêşangeha hunerî û nîşanî civakê bide û bêje: " Binêrin, a ku we avêtibû ev berhema hunerî bû, ha ji we re ruh û dilê we!"

***Wekî hûn dizanin gelek ziman li cîhanê ji holê radibin û tune dibin û em dibînin ku her diçe bi taybetî jî li bakurê Kurdistanê bikaranîna kurdî kêm dibe. Li gorî we divê çi were kirin ku pêşî li vê talukeyê were girtin.?***

Fen û fûteke serdestên tirk heye ku dibên, "Siyasetmedarên kurd her tim siyaseta nasnameyê dikin." Siyasetmedarên kurd jî dikevin ber fediyê û xwe xwaromaro (tirkomirko) dikin. Ev lîstik an jî feqeke serdestan e. Divê em ji niha bêhtir û xurtir siyaseta nasnameyê bikin; ji ber ku em negihaştine nasnameya xwe, zimanê xwe; kengî em gihaştinê, wê çaxê em dev ji siyaseta nasnameyê berdin. Lê bi vê ve girêdayî em doza aboriyê jî bikin; ji ber ku zimanekî bêaborî qîmeta wî kêm e, roj bi roj dihele.

Siyasetmedarên kurd ji bo civakê model in, divê siyaseta nasnameyê tam bi cî bînin. Hevserok, parlamenter, peywirdar divê bi kurdî zanibin. Heke nizanibin bera dest bi ferbûnê bikin. Zanebûn jî ne bes e, gerek li her derê bi wî zimanî bipeyivin. Daxuyaniyên wan -ên girîng ya jî ne girîng- bi kurdî bin. Lê heger nekin em çi bikin? Ha ev pirs girîng e. Gava nekin em ê bi hilbijartinan de raya xwe nedin wan. Gava zanibin ku mesele ewqasî cidî ye wê bibin bilbil, wê zanibin ku dew birê mast e. Bi vî awayî wê kurdî hinekî geş û civakî bibe.

***Hûn wekî xemxurekî zimanê kurdî ku salên dirêj bi karên ziman û bi taybetî jî di warê helbestê de xwedî berhemên hêja ne, rewşa heyî ya zimanê kurdî çawa dinirxînin? Li gorî we astengî û pêkanînên li dijî zimanê kurdî çi ne û mirov çawa dikare li hemberî wan li ber xwe bide?***

Heta ku kurmancî nebe zimanê zanist û siyaset û huner û felsefe û disiplînên din, û her tim bi tenê pê hesûdî û fesadî û paşgotinî bê kirin pêş nakeve.

Divê kurdî bibe zimanê fermî û perwerdehiyê. Heke dewlet vê yekê qebûl neke gerek em di nav xwe de wî bikin fermî. Mal mekteb e, em dikarin li mala xwe û li ciyên xwe yên din zimanê xwe yê fermî bikin bi kurdî. Em dikarin vêya bikin lê em nakin. Pirsa rast ev e: Çima em nakin?

Ji ber ku em ji zimanê xwe bêtir heyranê zimanê xelkê ne em nakin. Dê û bav bi xwe re nabînin ku peyveke kurdî rê zarokên xwe bidin, guh nadinê. Di me de hişmendî qels e. Derûnî, a bindestiyê ye. A ku psîkolojiya bindestiyê têk dibe, xwendin û zanîn e. Kurd naxwînin hey li devê serdestê xwe dinêrin. Heta derûniya bindestiyê neşikê wê kurmancî qels be û yekîtiya me çênebe. Ango ji ziman pêştir û ferztir derûnî pêwîst û pirsgirêk e. Divê berê em derûniya xwe sererast bikin, pê re wê zimanê me jî xurt bibe. Di kurdan de zanistiya psîkolojiyê pir hatiye îhmalkirin, her tişt bûye siyaset. Ronahî di psîkolojiyê de ye. Divê berê derûnî çareser bibe.

***Di qedexekirinan de çima desthilatdarî ji berê û heta niha herî pêşî ziman hatiye hedef girtine û axaftina bi kurdî qedexe kirine ?***

Kemalîzma pozîtîvîst çawa zimanê xwe rût kiribe, dixwaze kurdî jî tune bibe. Lê ecêb e, leşkerekî wek Mistefa Kemal ê ne zimanzan, çi ji zimanan fam dikir ku biryara guhertina ziman û alfabeyan bide? Ên ku vê qiyametê bînin serê zimanê xwe îcar hesab li cem we bê wê çi bînin serê zimanê xelkê!

Avakarên vê dewletê pozîtîvîst bûn. Pozîtîvîzm ji du tiştan hez nake, bi tenê ji yekî hez dike; ji ber ku yê din ji bo sîstemê xetere ye, rê li ber pêşketinê digire: divê bi tenê zimanek hebe, olek hebe, stranek hebe, ramanek hebe… ku bibe dudu, îş jê xera dibe; bala xwe bidinê heta bi reşikên Afrîka û sorikên Amerîkayê jî dikin tirk.

Heta ku ramana vê dewletê ya pozîtîvîst neguhere, kurdî nabe zimanê fermî. Ekola Frankfûrt û postmodernîstên fransî mala pozîtîvîzmê xera kir, êdî pozîtîvîzm li dinyayê nemaye, lê rayedarên bêhiş ên dewletê pozîtîvîzm ji xwe re kiriye pûtek û dev ji hebandina wê bernadin. Heta ku ev dewlet wilo be wê yeka wê nebe "dudu". Di vir de pirs ew e ku em jî Kemalîst ango pozîtîvîst in yan na?

***Hûn wekî weşangerekî rewşa wêjeya kurdî li bakur û asta wê çawa dibînin?***

Di sînemegerê fransî Godard de kameraya nîşanker carna ne ji bo ku nîşan bide, tam dijberê wê ji bo ku "veşêre" tê bikaranîn: heke bûyer an jî neheqiyek hebe û tu berê kamerayê bidî giya û kulîlkan, tu bi alava kamerayê wê neheqiyê vedişêrî. Wêjeya kurdî jî wero, ji dêvla ku neheqiya li civaka xwe û hîs û ramanên xwe eşkere bike, vedişêre. Wêjeya kurdî "veşartok"ek e. Ji ber civaka feodal û helbet zexta dewletê em ditirsin ku hest û ramanên xwe eşkere bikin. Wêjeya kurdî bi vî halê xwe ne zelal e, ji ber wê jî zêde nayê xwendin. Nivîskar ji xwendevan dixwaze ku ew ji tiliya xwe bîn bike, jê re alavên hundirê pirtûka wî sererast bike; lê ji bîr dike ku yê "zelalker" ew bû û xwendevan xwe lê girtibû ku bi pirtûka wî zelal bibûya. Xwendevanên kurdî ditirsin ku pirtûkeke kurdî bixwînin: Hem ji tarîtiya hundirê pirtûkê ditirsin û hem jî ji tarîtiya dewletê. Lê hêviya min heye.

***Ji bo hevpeyvînê em spas dikin.***



## RÊNAS JIYAN kî ye?



Di 1'ê sibata 1974'an li Qosera Mêrdînê ji dayik bû. Li Zanîngeha Dîcleyê Fakulteya Perwerdehiyê beşa Mamostetiya Seretayî xwend. Piştî zanîngeh qedand dest bi mamostetiyê kir. Di 1999'an de dîwana wî ya yekem Janya çap bû. Di havîna 2003'yan de ekola "Çirûskîzm"ê aşkera kir. Ji sala 2003'yan û vir ve edîtoriya Weşanên Belkiyê û di sala 2007'an de bi destpêkirina kovara Çirûskê dîrektoriya wê dike. Ji sala 1999'an û vir ve gelek berhemên wî yên helbestan û çend romanên wî hatine çapkirin.

330x500 rupel 5+++:Layout 1  21.12.2019  14:37  Page 1    (Black/Black plate)





Stêrka Gelawêj

**Yildiz Çakar**

# "...Beşera dilê min delêl"

Yek hebû, yek tunebû… ê hebû ne yê me bû, yê tune bû aliyekî me yê winda bû. Ji hebûna me ya li darê dinê, em herdu li wî aliyê winda bûn.

Çiqas em nêz dibûn ewqas ji me dûr diket, çiqas me xwe lê digirt ewqas ji me re dibû xerîbek. Dîsa jî me ji wê xêrîbiyê hez dikir, bê ku me wateyeke din lê bikira. Ji ber ku hêdî hêdî, piço piço em hînî aliyên tunebûnê bibûn. Çiqas em kêm dibûn tarîtiya tunebûnê ewqas li me zêde dibû. Û vedigeriyan em!

...ji wê tarîtiya di navbera hebûn û tunebûnê de. Çiqas em vedigeriyan, vedigeriya rê ji bin lingên me. Hebûna me dibû devê kêrekê û li dora me diket, diketin çîrokên me ji berîkên jiyanê. Gotina dapîrên me li darbestan diket.

-Kes ji bo sewdayan li dora kesan diket

Ketibû dil, bêçare, qûdimşikestî… şikestîbûn hemû bîranînên me. Dema me behsa yekî/ê bikira yê/a din stûyê xwe xwar dikir li ber. Dema dengê kenê ba, ya din hêsir lê bar dikirin. Me bar dikir! Ji wî konî, ji wê axê. Me hemû cilên xwe yên rengo rengo li wir, li sindoqên bûkaniyê ji bo ku birizin, dihiştin û me radihişt girînên xwe û em diçûn. Diçûn em -belkî- careke din li xwe bizivirin.

Kewên xirxalî yên li ser banan bê dest diman ji xwediyên xwe, hespên kihêl diman li ber golegeniyan. Bi guleyan li moriyan dixistin. Dixistin hêlînên hechecikan ji kozikên şaneşînan. Şîn digirt asîman! Man û nemanê li bênderan bi moxilê dixist qeder, qedera kurmancan. Kurmanc dotmam e!

… xwediya bê, tahma avê, germahiya axê, kilama dê û bavo. Çîroka keça paşê, qûzika tijî dims û mewij, gulgulokên rengo rengo yên di paşila zarokên rojê de, dahatûya pismamo... bi hezaran sal e yeko yeko dike ta, ta bi ta dineqişîne kofiya kurmancan. Kurmanc dotmam e, şirîkên guliyên wê li hev badane, bazinên destê wê dozdeh stêrkên asîman e, zengil zîv e, xizêm zêr e, nexşa sîng û berê wê beşera eşqa bê ber e... navê pismam delêl e!

Kurmanc dotmam e.

Ji mirinan mirinek pesandiye, loma jî dilê xwe ji darbestekê re li ser navê jiyanê diyarî daye. Nebêje 'dotmam çima cilên te reş in?', ji zêmaran ax fîstanekî xweş e. Giran e kedera erdê, çiqas diçe her û her li dû tê. Tê giriyên bêsedem, sedem kor e eşq. Loma jî em vedigeriyan bîrên xwe yên tarî û kêliyên xwe yên bêdemî. Ji dûr ve ji nav kilamekê dengek me ber bi xwe ve dikişand.

*"Beriya Mêrdînê beriyeke dûz e,*
*pozê Qerejdaxa şewitî bi ser de xûz e"*

Li vir em roja ku bi çavan lê digeriyan û nedidît, me bi destan dixwest bibînin. Tenê ji bo rojekê... di navbera deşta bê ber, çiyayê bê ser de...

Kurmanc Kurdistan e, pismam!

Stêrka ser dil e, dermanê birîna kûr e… kûr e çîroka me. Ji heft bavê hûtan mezintir e.

Kurmanc hêrsa bav û kalan e, deriyê tifaq û xweşiyan e. Nebêje dotmam te çima destê xwe avêt kevirên di stûyê xwe de û bi yek carî hilqitand kulîlka binevşê?

...beşera dilê min. War ew war e, lê bihar ne ew bihar e. Heta ku delêl li kurmancê bê!



Ehmedê Xanî yek ji wan kesên pêşîn e ku bi êşa parçebûna welatê xwe hesiya. Evîna Mem û Zînê kir bahane da ku kurd tifaqa xwe çêbikin

# Dîsa û ji nû ve Mem û Zîn

**Ramazan Olçen**

Vaye rojnameyeke din a kurdî alaya ku ji rojnameya kurdî ya yekem; Kurdistanê wergirtî, li ezmanên welat li ba dike. Em yeqîn dikin, wê weke Hetawê şewq û rohaniyê bide derûdora xwe. Wê stêra me ya geş a Gelawêjê be û di şevên bêyî hêvî de em ê hewya xwe pê bînin. Wê beriya herkesî xwe bigihîne

Hawara gelê xwe. Wê cehdê bike; helbet bi cehda xwe wê miradê jî bi destê xwe hasil bike.

Di vê dem û dewranê de, dewletên herêmî û hêzên mezin ên cîhanî ku weke keftaran bi goştê canê vî welatê parçekirî ketine, XWEBÛN wê bi Ronahiya xwe bibe meşaleya qetidandina van qîlbixwînan.

Çi navekî xweş e ne; XWEBÛN. Ma ne ji ber ku di herka dîrokê de kurd nebûn ên xwe hatin qirkirin. Ma ne ji ber ku bûbûn dij-xwe ji rastiya xwe dirEviyan. Ma ne ji ber vê rewşa ji ketîtiyê jî ketîtir bû, welatê me bûbû parçe û dagir.

Helbet yên li dij-me ne tu carî naxwazin bibin em bibin ên-xwe heta îro wisa lê hatiye ku naxazin em weke kole û bindest jî he-bin. Dixwazin me qirr bikin û tune bikin. Îcar li dijî vê 'atîkurdîzmê' 'kurdîzmeke' xas divê. Xwebûn divê. Ev 'kurdîzm' di nav deryaya reng û dengan de jiyana bi aheng lê bi reng û dengê xwe ye.

Helbet di nav gelê kurd de ewladên wî yên xas hebûn û hê jî hene. Di nav vî gelê qedîm de tu carî maqûl û rewşenbîr kêm nebûne. Û helbet destpêkê evanên xas bi êşa dij-xwe-bûnê dikevin. Pêşî ew dixwazin civak bibe; êxwe. Êşa wan ji van re dibe sermiyan û pê dilorînin, dinehwirînin, distrên, dibêjin, dinivisînin û nîşan didin.

Di vê rêwîtiya dijwar de jî herî zêde ew in, yên tehdeyê dibînin. Helbet ne muptelayê êşê ne û dixwazin xwe ji wê êşê xelas bikin. Lê ji ber ku ji bo serbestiyê çavên xwe kutane bala û bilindahiyan û ji wan deran bi çavên eyloyan li asoyê dinêrin, ew bayê serbestiyê ku li bin per û baskê wan dixe dilê wan ê ji êşê sincirî hênik dike.

Îcar piştî ev qas galegalan, êdî wext e ku ez behsa eyloyekî ji wan eyloyan bikim. Em îro roj jî hewl didin bi nivişt û berbejnên ku me ji şîretên wî çêkirine vê rêwîtiyê dewam bikin.

Ev eyloyê ku hê jî dengê wî li ezmanê welat olan dide Ehmedê Xanî ye. Ehmedê Xanî yek ji wan kesên pêşîn e ku bi êşa parçebûna welatê xwe hesiya. Û bi gotina cenabê wî, wî ji xwe re evîna Mem û Zînê kir bahane da ku kurd tifaqa xwe çêbikin û xwe ji bin-destiyê xelas bikin. Sînoran hêj ji wê demê ve qebûl nekin.

Di vê serdema hanê de jî ev par-çebûna hê ji wan wextan, nahêle ku em bibin ên-xwe. Dij-me jî ji ber vê yekê li ser qedera me hûkmê didin. Ji rojnameya me ya yekem Kurdistanê vir ve di vê nivîsê de min navê çendîn weşanên me yên din jî zikir kirine – helbet weşanên kurdî bi van bi tenê bi sînor nebûn lê melûm e mirov nikare hemûyan jî di nivîsekê de rê bike-, heta xwe gihandiye Welat û bi Azadiya Welat(ê Me) ji xwe re kiriye destûr, di nushaya xwe ya yekem de cih dane vê qîrîna Ehmedê Xanî yê nemir. Bêyî îstîsna di hemû weşanên me de Ehmedê Xanî û Mem û Zîn hene.

Lê helbet tu tişt weke berê namîne, di nav demê de li xwe kêm û zêde dike. Mem û Zîn jî weke berê nabe ku bimînin. Li gorî ruhê vê demê, xwendineke nû divê, lêgerînên nû divê.

Ma ne kesên bigerin wê bibînin jî. Naskirin û hezkirineke nû divê. Ji nû ve û dîsa nivîsandina Mem û Zînê divê. Gihiştin divê. Şadbûn divê. Azadî divê û Welat divê. Ma ne her evîn encax di hêlîna xwe de geş e. Wê demê bi ilm û zanîna eyloyê li nav deryayeke, li ser giraveke di qefesê de esîr; Xwebûn divê.

## Ziman û Raman



Samî Tan

# Helwesta zimanî û çarenûsa zimanî

Piştî navbereke dûvedirêj ji nû ve merheba ji we ra gelî xwînerên heftenameya Xwebûn.  Xwebûn, xwenasîn e. Mîr Celadet Bedirxan di hejmara yekemîn a Hawarê da dibêje, "Zanîn xwenasîn e, xwenasîn ji me re rêya felat û xweşiyê vedike.  Her kesê ko xwe nas dike; dikare xwe bide naskirin." Heta ku em nebin xwe û xwe nas nekin, em nikarin xwe bidin nasîn û pejirandin. Bi vê bîr û baweriyê tu xêr hatî Xwebûn!

Ji niha û pê ve ez ê her hefte di vî quncikî da gotarekê pêşkêşî we bikim . Ez ê ji we ra qala çi bikim? Her wekî pêşîyên me gotine, "Çil çîrokên hirçê hene, hemû li ser hirmê ne" ez ê qala zimanê kurdî bikim. Ji ber ku stûna sereke ya Xwebûnê ziman e, yekî/a ku ziman û çanda xwe nas neke, avê ji kanîya zelal a ziman û çanda xwe venexwe, pê tîna dilê xwe neşikêne, ne dibe xwe, ne dikare xwe nas bike û ne jî dikare xwe bide nasîn û pejirandin.

Em ê li vê derê di çarçoveya ezmûna cîhanî û zanista zimannasîyê da qala zimanê xwe û rewşa zimanê xwe bikin. Dema zimannasî tê gotin, belkî bi tenê rêziman were bîra gelek kesan, lê belê qada zimannasîyê gelekî berfireh e, têkilîya zimên bi gelek şaxên zanistê ra heye, ji ber vê yekê  li gel zimannasîya teorîk, zimannasîya pêkarî di nav zanista zimannasîyê da pêk hatiye  û şax vedaye.  Ev şaxa zimannasîyê peywendîya zimên a bi gelek beşên zanistê yên mîna civak, dîrok, derûnî, mêjî ra dike warê lêkolîn û lêhûrbûnê. Bi taybetî ji bo zimanên ku di rewşa zimanê me da ne, zimannasîya civakî, zimannasîya derûnî, zimanwergirî , plansazîya zimanî, vejiyandin û geşepêdana zimanî mijarên girîng in. Em ê di vî quncikî da bala xwîneran bikêşin ser mijarên têkildarî van mijaran.

Di vê nivîsa xwe ya vê hefteyê da me divê em hinekî qala "helwesta zimanî" bikin. Helwesta zimanî jî têgiheke zimannasîyê ye, zêde bala xwe dide helwesta alîyên cur bi cur ên li hemberî zimanekî, di parastin û geşkirina zimanekî da helwesta axêverên wî zimanî pir girîng e. Pirî caran ev helwest çarenûsa zimanekî diyar dike. Me her tim bal kişandiye ser helwesta dewletan û desthilatîyan, lê  helwesta axêverên zimanekî dişên helwesta desthilatîyan jî biguhêrin.

Gelo helwesta me ya zimanî çi ye? Di vî warî da ne tenê xwende û rewşenbîr, helwesta hemû beş û tebeqeyên civakê girîng e, ne tenê helwesta pevrayî, helwesta takekesî jî pir girîng e.  Belkî bala gelek xwînerên rojnameyê kişandibe, şîrketa rapirsînan Rawestê çêkiribû, di vê rapirsînê de helwesta ciwanan a li hemberî zimanê kurdî hatibû pîvan. Li gorî encamên rapirsînê rêjeyeke pir kêm (%18) hem axaftin û hem jî xwendin û nivîsandina bi kurdî dizane. Lê rêjeyeke zêde (% 84) perwerde û hîndekarîya bi zimanê dayikê dixwaze. Rast e, dixwaze lê ji bo vê yekê çi dike? Mixabin piranîya van ciwanan tiştekî nakin. Heke daxwazeke xurt û girseyeke di vî warî da çalak hebûya dê heta niha gelek dibistan û pêşdibistanan di mufredata xwe da cih bida kurdî. Lê mixabin tiştekî wisa pêk nehatiye.

Ji bo vê yekê jî pêwîst e her mirovê kurd helwesta xwe zelal bike. Kesên ku dixwazin dev ji vî zimanî berdin, bi zimanê tirkî bijîn, tu gotina me ji wan ra nîn e. Lê kesên din, ji bo geşkirina ziman û çanda xwe çi bar dikeve ser milê wan, divê wî barî hilgirin.   zimannasîya pêkarî: uygulamalı dilbilim/ applied linguistics

zimanwergirî: dil edinimi/ language acquisition

330x500 rupel 6++++:Layout 1 21.12.2019 14:35 Page 1 (Black/Black plate)



# Krîza aborî siyasî ye

## Nûnerên partiyên siyasî krîza aborî û siyasî nirxandin û gotin heke muxalefet bi hev re gav bavêjin dê li Tirkiyeyê gelek pirsgirêk bên çareserkirin û ji tengasiyên heyî dê ji holê rabin

NAVENDA NÛÇEYAN

Di vê hefteyê de mijara herî zêde derket pêş krîza aborî û siyasî bû. Li ser polîtîkayên ku tên meşandin gelek nîqaş hatin kirin. Hat diyar kirin ku divê li gorî hewcedariyên civakê polîtîka bên afirandin. Her wiha divê muxalefet jî li gorî pêdiviyan demildest bikevin nav hewldanan. Nûnerên partiyên siyasî li ser rewşa siyasetê rawestiyan û gotin divê ji bo çareseriya pirsgirêkên sereke û yekitiya gelên li Tirkiyeyê hewldan û têkoşîneke hevpar bê dayîn. Di rojên dawiyê de jî li ser banga hilbijartina pêşwext jî gelek nîqaş hatin kirin. Siyasetmedaran bal kişand ser nixumandina rojevên esasî yên Tirkiyeyê jî.

**'Rojeva esasî tê guhertin'**

Hevseroka Partiya Şoreşger Elîf Torun Oneren bal kişand ser geşedanên germ ên li Tirkiyeyê û got: "AKP bi rojevên cuda dixwaze xwe hêj li ser piyan bigire. Ew banga hilbijartina pêşwext a HDP'ê di cih de dibînin û pişgiriyê didin."

Hevseroka Partiya Jinûve Avakirina Sosyalîst (SYKP) Canan Yuce, destnîşan kir ku bêkarî û krîza aborî ya ku her diçe kûr dibe û wiha axivî: "Ev ne bes, îktîdar dixwaze muxalefetê jî bifetisîne. Banga vê hilbijartina pêşwext banga bindest, kedkar û yên ji vê rewşê ne razî ne."

**Li Tirkiyeyê krîza aborî û siyasî**

Hevserokê Partiya Pêşeroja Kesk a Çep (YSGP) Sînan Tûtal da zanîn ku piştî hilbijartina 31'ê adarê bloka AKP û MHP'ê rêjeyeke mezin deng winda kiriye û wiha bilêv kir: "Ev blok bi krîza aborî û siyasî re dihele. Wek kamyona ku nikare frên bigire ye. Berjêr dibe. Ew jî di ferqa vê yekê de ne. Ji bo aloziya heyî veşêrin qeyûm û şerê Sûriyeyê xistin meriyetê."



**Dixwazin xwe xelas bikin**

Seroka Giştî ya Partiya Kedkarên Sosyalîst (SEP) Guneş Gumuş jî da zanîn ku li cîhanê pêla raperîna kedkaran a cîhanê bilind dibe û wiha got: "Ji Rojhilata Navîn bigire heta Amerîkaya Latîn û ji Lubnanê heta Şîliyê li hemberî desthilatdariyê gel serî rakir. Li Tirkiyeyê jî krîzek heye û nerazîbûnek heye. AKP jî dixwaze xwe ji hemû tengasiyên xelas bike."

**'Bila destkeftî bên parastin'**

Seroka Giştî ya Partiya Kedê (EMEP) Selma Gurkan jî diyar kir ku îktîdar rejîma xwe ya siyasî li ser polîtîkayên zext, tundî, dijwarî, zayendperestî, pevçûnxwaz û şerxwaz ava kiriye û wiha axivî: "Kesên ku daxwaza mafê xwe dikin, aştiyê dixwazin û diparêzin bi êrîşan re rûbirû dimînin. Li dijî polîtîkayên heyî divê navendeke têkoşîna hevpar were avakirin."



## 'Xwe teslîmî ezberan nekin'

Parêzvana mafên mirovan ku yek ji damezerînerên berê ya AKP'ê ye, Fatma Bostan Unsal destnîşan kir ku hewcedariya Tirkiyeyê bi siyaseteke nû heye, lê nayê zanîn ku Ahmet Davutoglu û Alî Babacan ka vê

Fatma, qala pêşeroja AKP'ê kir û wiha axivî: "Hûn jî dizanin ku hilbijartin dê îsal di meha cotmehê de bihata kirin. Lê ji ber krîza aboriyê hilbijartin di hezîrana sala 2018'an de pêk hat. Ji ber krîza aboriyê piştgiriya ji bo AKP'ê dihat kirin kêm bû. Her wiha bandora krîza hiqûqê jî heye. Krîza hiqûqê bi xwe re krîza aboriyê jî anî. Cara yekem e ku di nav AKP'ê de krîzek heye û bi vî rengî û sûcdarkirina hevdu derket holê." Fatma diyar kir ku divê partiya nû xwe teslîmî ezberên berê neke û di roja me ya îro de ezberek heye lê divê ev tişt derbasî pêşerojê nebin."

## Gel daxwaza mafê xwe kir

Di nav rewşa aloz, şer û pevçûnan de di sala 2013'an de pergalek li Rojava hat pêşxistin. Ev tişt ji bo gelên Sûriyeyê bû hêviyek. Li gor vê pergalê divê civak li ser esasên azadî û wekheviyê xwe bi rê ve bibe. Têkildarî mijarê, Şêwirmenda Rêveberiya Xweser Dîlber Yûsif, asta pêşveçûn, destkeftiyên pergala Rêveberiya Xweser û rengê wê nirxandin.

Yûsif, diyar kir ku rewşa Sûriyeyê bi giştî û guhertinên ku di Rojhilata Navîn de çêdibûn, diyar dikirin ku pêwîstiya civakê bi şoreşa gel hebû û wiha dom kir: "Şoreşa gel dema dest pê kir, Sûriye jî yek ji wan welatan bû ku alozî tê de hebû. Gelan êdî pergala heyî û zihniyeta ku li ser wan dihat meşandin, qebûl nedikirin. "

Yusîf destnîşan kir ku di pergala welatên cîhanê de, rengê mêr tenê li pêş e û wiha dom kir: "Me ev şêwaz guherand. Helbet zehmetiyên wê jî hebûn, ji ber di tecrûbeyên wisa de, deriyek ji jinê re nehatibû vekirin, ne di aliyê leşkerî de û ne jî di aliyê rêveberiyê de. Di xebatên demokratîkbûnê de, me civakeke demokratîk ava kir. Me ne tenê bi teorî, me ev pratîze kir."

Yusîf di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Hişmendiyên desthilatdar ên ku li ser vîn û xwîna gelan li hev kom dibin, tu projeyên wan ên çareseriyê tune ne. Kesên ku mirovan qir dikin, banga çareseriyê ji bo welatan dikin û di welatê wan de mirov bi tunekirinê re rû bi rû mane."

# 'Nasnameya niştimanî biparêzin'

NAVENDA NÛÇEYAN

Li gel êrîşên ku li Rojava pêk tên jî gel xebatên siyasî, aborî, çandî, hiqûqî didin meşandin. Her wiha hewldanên ku bi pekhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê tên kirin mohra xwe li xebatên siyasî dide. Herî dawiyê bi navê "Qirkirina nijadî û guhertina demografîyê ya li Bakur û Rojhilatê Sûriyê" komxebatek hat lidarxistin û nîqaşên berfireh hatin kirin.

Navenda Lêkolînên Stratejîk a Rojava (NRLS) bi navê "Qirkirina nijadî û guhertina demografîyê ya li Bakur û Rojhilatê Sûriyê" komxebatek li bajarokê Rimêlanê yê girêdayî Kantona Qamişloyê hat lidarxistin. Siyasetmedar, hiqûqnas, rewşenbîr, nivîskar, nûnerên ji saziyên civaka sivîl, malbatên şehîdan, saziyên mafên mirovan, akademîsyen û nûnerên ji pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê tev li komxebatê bûn. Komxebat di 18'ê kanûnê de pêk hat û rojek dom kir.




**Belge hatin komkirin**

Encamnameya komxebatê hat aşkerakirin. Ji encamnameya Komxebatê çend xalên giring: "Mal û milkên ku hatin talankirin, kuştina sivîlan, rewşa koçberan hatin belgekirin. Divê sûcdar bên cezakirin û dozgeriya navneteweyî û rêxistinên parastina mafên mirovan li gorî berpirsyariya xwe tevbigerin.

**Bila koçber vegerin**

Ji saziyên civaka navneteweyî û Neteweyên Yekbûyî tê xwestin ku stratejî û çalakiyên siyasî û mafnasiyeke wekhev pêk bînin. Her wiha ji dewletên ku misogeriya rêkeftinên agirbesta li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê kirine hat xwestin ku divê êrîşên li ser herêmê rawestînin û bila koçber vegerin herêmên xwe.

**Berxwedana xwe bilind bikin**

Divê civaka navneteweyî komên wekî Cebhet El-Nusra û DAIŞ'ê di lîsteya terorê de binirxîne. Saziyên NY'ê bi erka xwe tevbigerin û vîna siyasî ya li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê beşdarî hemû xebat û kongreyên girêdayî qeyrana Sûriyeyê bikin. Divê dadgeheke navneteweyî bê avakirin ku sûcdar bên darizandin. Asta piştgiriya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê û Hêzên QSD'ê zêde bikin, berxwedanê bilind bikin û nasnameya niştimanî biparêzin."

**Li dijî kiryaran yekitî**

Endama Meclîsa Kantona Efrînê Nûrşan Husên tevlî komxebatê bibû qala qirkirina nijadî û guhertina demografîyê kir û wiha got: "Çareseriya herî sereke ji bo kiryaran divê gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê yekitiyek ava bikin."

Husên, di axaftina xwe de bal kişand ser mijarên komxebatê û wiha dom kir: "Li dijî qirkirina nijadî, çandî û fizîkî komxebatek hat lidarxistin û di komxebatê de li ser çareseriya pirsgirêkan jî nîqaş hatin kirin. Gelê Sûriyeyê bi taybet gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ji bo wekheviya gelan ava bikin her tim têkoşîn dane."

Nûrşan Husên diyar kir ku guhertina demografîk a Efrînê, bi belgeyan pêşkêşî komxebatê kirine û wiha got: "Me belgeyên guhertina demografiya Efrînê pêşkêşî komxebatê kirin. Di belgeyan de kiryarên li ser gel hatine meşandin, binpêkirina mafên mirovan û hejmara kesên ku hatine qetilkirin, revandin û îşkencekirin hemû nivîsandine." Husên, da zanîn ku bi yekitiyê dê li dijî kiryaran derkevin û mafê xwe biparêzin û wiha dawî li axaftina xwe anî: "Gel çiqas bibin yek û ronakbiriyekê avabikin ewqas wê bi ser kevin. Bila sazî û rêxistinên navneteweyî ji bo guhertina demografîyê bê deng nemînin."

# Xebatên yekitiyê xurt dibin

Xebat û hewldanên li darxistina kongreya yekitiya neteweyî didomin. Li her çar parçeyên Kurdistanê partî, rexistin û saziyên sivîl ji bo parastina destkeftiyên kurdan bal kişandin ser yekitiyê

NAVENDA NÛÇEYAN



Piştî hewldanên Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK) li tevahiya Kurdistanê û li Ewropayê kurd ji bo yekitiya neteweyî ku pêk bînin û kongereyekê ji bo yekitiya neteweyî ku bi tevlibûna nûnerên rêxistin û saziyên kurd ên her çar parçeyên Kurdistanê tevli bibin li dar bixin ketin tevgerê.

Di vê çarçoveyê de li Başûr, Bakur û Rojava û li Rojhilatê Kurdistanê, her wiha li Ewropayê nûnerên gelê kurd, sazî, rêxistin, hunermend û rojnameger ji bo yekitiyek di nav gel de bê avakirin gelek civîn, konferans hatin lidarxistin û daxuyanî dan.

**Li Başûr rêzecivîn**

Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK) ji bo lidarxistina Kongreya Yekitiya Neteweyî demek dirêj e di nav liv û tevgerê de ye. Di vê çarçoveyê de li başûrê Kurdistanê bi sazî, rêxistin û partiyên siyasî ên kurd re hevdîtinên berfireh hatin kirin. Heta niha bi 38 sazî, rêxistin û partiyên siyasî re hevdîtin kirin. Her wiha ji derveyî PDK'ê hemû partiyan hevdîtin qebûl kir û civîn erênî derbas bûn.

**Li Bakur xebatên yekitiyê**

Her wiha li bakurê Kurdistanê jî partiyên siyasî ji bo yekitiya kurdan ketin nav hewldanan. Di hefteyên borî de Nûnerên Kongreya Civaka Demokratîk (KCD), Partiya Demokratîk a Gelan (HDP), Partiya Herêmên Demokratîk (DBP), Komeleya Kurdên Demokrat ên Şoreşger (DDKD), Partiya Demokrat a Kurdistanê-Tirkiye (PDK-T), Partiya Demokrat a Kurdistanê-Bakur (PDK-Bakur), Partiya Mirov û Azadiyê (PÎA), Tevgera Azadî, Partiya Azadî, Partiya Komunîst a Kurdistanê (KKP) bi rojeva 'yekitiya neteweyî' hatin gel hev. Li gel ku banga tevlibûna civînê li wan hat kirin jî nûnerên Partiya Sosyalîst a Kurdistanê (PSK) û Partiya Azadiya Kurdistanê (PAK) tevlî civînê nebûn. Encamên ku di civînê de derket holê dê li Ewropa, başûr, bakur û rojhilatê Kurdistanê bên nirxandin.

**Li Ewropayê meş**

Di 5 û 6'ê kanûnê de zêdeyî sed siyasetmedar, nivîskar, hunermend, rojnamevan, akademîsyen, nûnerên sazî û partiyên siyasî yên ji çar parçeyên Kurdistenê ji bo yekitiya neteweyî ji bajarê Lozanê heta Cenevreyê meşek li dar xistin. Di meşa ku hat lidarxistin de hat destnîşankirin ku kurd di vê serdemê de gihîştine wê astê ku bi yekitiya neteweyî karibin encamê bigirin.

**Divê destkeftî bên parastin**

Ligel çalakî û hewldanan, nêrînên welatî, nivîskar û siyasetmedaran jî di rojeva vê hefteyê de cih xwe girtin, banga yekitiya neteweyî berjewendiyên niştimanî bi parêzin derket pêş.

Endama rêveberiya Yekgirtiya Îslamî ya Kurdistanê Nîga Seîd got: "Ger aliyên siyasî ji bo destkeftiyên niştimanî dev ji mijarên rêxistinê bernedin, wê nekaribin bigihîjin armancên xwe jî. Divê rêxistin dostên miletê xwe bin."

**Ji bo gel xizmetê bikin**

Nivîskar û endamê înîsiyatîfa hunermend û rewşenbîrê kurd Melevan Resûl bang li aliyên siyasî yên kurd kir ku divê partiyên kurd bê şert û merc Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê li dar bixin.

Hunermend Selah Îbrahîm bang li partiyên kurdî kir ku berjewendiyên derve terk bikin û ji bo xizmeta gelê xwe kar bikin.

Hunermend Mihemed Şêxmûs da zanîn ku pêwîst e êrişên li ser herêmê werin sekinandin û wiha axivî; "Ji bilî yekrêziya kurdî tu rê li pêşiya me nîn e. Lewra divê partiyên kurd hêza xwe bi rêxistin bikin û ji bo berjewendiyên vî gelî kar bikin."

## 'Divê xizmetê ji gelê kurd re bikin'

Şandeya KNK'ê hevdîtinên xwe di nav hefteyê de jî domandin. Şandeya KNK'ê di çarçoveya xebatên ji bo avakirina yekitiya neteweyî de, çû serdana Rêxistina Kurdên Feylî Bo Mafên Mirovan.

Di hevdîtinê de şandeya KNK'ê derbarê avasaziya KNK'ê de, her wiha xebatên wê yên ji bo yekitiya neteweyî de, agahî dan. Endamên şandeyê destnîşan kirin ku berxwedanên li bakur û rojavayê Kurdistanê hatine nîşandan, kurd zêdetir nêzî hev kirine. Endamên şandeyê dan zanîn ku Kurdên Feylî jî gelek êş kişandine, lewre pêwîst e kurd hemû hevkariya hev bikin û yekitiya xwe pêk bînin.

Rêveberên Rêxistina Kurdên Feylî Bo Mafên Mirovan jî kêfxweşiya xwe ya ji ber serdana şandeya KNK'ê anî ziman û bal kişand ser girîngiya yekitiya neteweyî. Reveberan her wiha got ku ew jî dixwazin bi KNK'ê re kar bikin.

Endama Konseya Rêveber a KNK'ê Şehla Hafîd û Seroka Rêxistina Kurdên Feylî Bo Mafê Mirovan Nezîra Îsmaîl Kerîm, destnîşan kir ku ew gelekî girîngiyê didin Kurdên Feylî, sedema serdana wan a îro jî ev e û da zanîn ku wan di hevdîtinê de behsa pirsgirêkên kurdên feylî kiriye, her wiha li ser rêyên çareseriya pirsgirêkan rawestiyane. Şehla Hefîd bibîr xist ku wan heta niha li ser pirsgirêkên kurdên feylî 3 konferans li dar xistine û niha jî hewl didin ku peywendiyên Komiteya Kurdên Feylî ya KNK'ê bi rêxistin û saziyên li Herêma Kurdistanê û Iraqê re xurt bikin."

'Armanca me yek e'

Nezîra Îsmaîl Kerîm jî diyar kir ku ew dixwazin bi KNK'ê re hevkarî bikin û got: "Ji ber ku armanca me hemûyan yek e. Weke miletekî serbilind, divê em nîşanî gelên cîhanê bidin ku em kurd yek in. Me beriya niha dixwest tevlî kongreya KNK'ê bibin, lê mixabin ji ber pirsgirêka vîzeyê pêk nehat. Em dixwazin hevkariya hev bikin û xizmetê ji gelê kurd re bikin."



## Ji bo xebatan komîteyek hat avakirin

Bi dirûşma "Ber bi konferansa niştimanî û nexşerêya çareseriya doza Kurdistanê' li Silêmaniyeyê bi tevlîbûna rewşenbîr, aktivîst û siyasetmedaran civînek hat lidarxistin. Di encama civînê de komîteyek hat avakirin. Komîteya ku hatî avakirin dê xebatên yekitiya neteweyî bi rê ve bibin. Komîte dê ji bo yekitiyê li bajaran semîneran li dar bixin.

***Di civînê de ev nexşerê jî hat pêşniyar kirin û xalên nexşerêyê wiha ne:***

✓ Destpêkê pêwîst e hemû ragihandinên fermî û ne fermî, hemû torên civakî di van şert û mercan de li gorî berpirsyarî û erka xwe tevbigerin. Divê bi yekrêzî û bernameyên taybet pêşkêş bikin. Berpirsyariya dîrokî a xwe bicih bînin û zêdetir xelkê hişyar bikin.

✓ Pêwîst e li gorî roj û demek diyar, bername bi nûnerên hemû aliyên siyasî, pekhate û hemû kesayetên navdar yên civakê re were kirin. Nûnerên Neteweyên Yekbuyî ji bo nîqaşên siyasî yekgirtî û diyarkirina rêya çareseriyeke demokratîk ji bo pirsgirêka gelên Kurdistanê danîn holê.

✓ Di civîna giştî û berfireh de, komîteyek giştî, siyasî, dîplomasî, ji bo kar û rêya çareseriya pêşniyaran a gelên Kurdistanê bê diyarkirin.

Di civîna ku hatî lidarxistin de li ser rewşa rojavayê Kurdistanê jî nîqaş hat kirin û hat diyarkirin ku dijî êrîşan divê yekitiya Kurdan pêk were.



Felemez Ulug

## Kremlîn vala hat derxistin

Di 19'ê kanûna 2019'an de li Rûsyayê du bûyerên mezin pêk hatin. Her çiqas mijar û şêwaz ji hev cudabin jî ji ber bandora wan a li ser hev bi awayekî yekser ketin rojeva siyasî ya Rûsyayê.

Serokdevletê Rûsyayê Vlademîr Pûtin civîna mezin a çapemeniyê ku ji sala 2001'an vir ve tê lidarxistin îsal bi beşdariya hezar û 895 rojnamevanî pêk hat.

Pûtin, di van civînên ku bûne kevneşopiyek desthilatdariyê de li pêşberî endamê çapemeniyê xebata xwe ya salekê dinirxîne. Di van civînan de ji mijarên aborî, çandî, spor, perwerde, tenduristî bigrin heya mijarên ewlekariyê, tekiliyên navneteweyî, polîtîkaya navxweyî û derve gelek mijar tên dest girtin û nirxandin.

Ev civînên ku her sal di dawiya meha kanûnê de pêk tên, ji ber ne diyar e wê kengî bi dawî bibe jê re tê gotin 'civînên mezin ên çapemeniyê'. Di vê civînê de ji derveyî rojnamevanan gelek deverên cuda kesên xwedî pîşeyên cuda jî beşdarî vê civînê dibin.

Pûtin îsal civîna 15'emîn li dar xist. Civîna herî dirêj di sala 2008'an de pêk hatibû. Ev civîna ku 4 saet 40 deqe berdewam kiribû, ji hêla Kremlînê ve wek civîna herî dirêj û bi bandor tê nirxandin. Civîna îsal jî 3 seat 43 deqe berdewam kir. Asta civîna îsal û nirxandinên ku di civînê de hatin kirin, ji hêla Kremlînê ve pir girîng tên dîtin.

Her çiqas di vê civînê de li ser gelek mijarên cuda pirs û bersiv pêş ketibin jî, mijarên sereke diyar bûn. Rojnamevanên ku beşdarî civînê bibûn derbarê polîtikaya Rûsyayê ya Lîbya û Sûriyeyê de gelek pirsên cuda ji Serokdewletê Rûsyayê kirin. Li ser pirsa hevkariya leşkerî ya Rûsya û Çînê jî pirs hatin kirin. Pûtin bi awayekî aşkera diyar kir ku di vê mijarê de bi Çînê re tu hevkariyên wan nîn in.

Pûtin ji bo pirsa derbarê Lîbyayê de got ku ew bi hêzên hikûmeta heyî û hêzên muxalif re di nav diyalogê de ne. Her wiha mijarek din a girîng ji ew e ku Pûtin wê mijara Lîbyayê bi şandeya tirk re bi awayekî berfireh binirxînin. Wisa diyar e ku Rûsya û Tirkiye çawa li Sûriyeyê di nav hevkariyê de ne wê di mijara Lîbyayê de jî vê hevkariya xwe berdewam bikin.

Di civînê de li ser gelek mijarên cuda nirxandin hatin kirin. Civîna Pûtin bû rojeva welat. Lê piştî civîn bi dawî bû û ajans û televîzyon bi awayekî lezgîn êrîşa li ser avahiya Navenda Têkiliyên Giştî ya Karûbarên Ewlekariya Federal a Rûsyayê radigihandin. Di vê êrîşa terorî de esek jiyana xwe ji dest da û du kes jî birîndar bûn. Kesê ku ev êrîş pêk anî hat kuştin. Lê derbarê vî kesî de tu agahiyên berfireh bi raya giştî re nehat parvekirin. Di roja civînê de êrîşeke bi vî rengî ji bo rêveberiya Kremlînê derbayek mezin bû.

Kremlîn xwest ku rojeva siyasî ya sala 2019'an bi civînê bixemilîne û dawiyê li salê bîne. Lê vê êrîşê planên heyî vala derxistin. Dê ev mijar hîn pir bê nîqaşkirin û ji bo vê êrîşê gelek senaryo bên rojevê. Ya girîng ew e ku ji niha ve civîna Pûtin vala derketiye. Lê ev kesê çalakger û armanca çalakiyê divê bên aşkerakirin.

330x500 rupel 8+++++:Layout 1 21.12.2019 14:34 Page 1 (Black/Black plate)



Ax! Welato

Ayhan Erkmen



# Ferman û koçberî

‘’Ya şems, ya serê siba ezîz, derge dîwanê Şêx Adî, tu herî hewariya heftê du miletan, hewariya rêwiyên riyan, nefsên tengiyan, serê li ser balgiyan, paşê jî bêyî hewariya me. Ya Melekê Tawis, serê min qurbana te be, tu were hewariya me. Tu me, ji vî derê teng, derxe”[1]



Ax (xwelî) dema di destê xwediyê xwe de be, xwedî bextewar e, jiyan bihuşt e. Ax! Dema nîn be, xem xwedî dikuje, jiyan dibe dojeh.

Min dil heye ku di vî quncikê “Ax! Welato” de, li pey şopa kesera ax û welat bikevim. Herim serdana cih û warên bav û kalan, yên ku Xwedî, ji destê bê Xwedêyan, sedan sal in jê dûr in.

Di encama hin şeran de, êzidî bi fermanan re rû bi rû mane û cih û warên xwe terikandine. Êş û azarên mezin jiyane. Kal, pîr, dê, bav, xwişk, bira û ewlad winda kirine. Bi salan hesret kişandine û bi wê hesretê, can ji bedenan kişiyaye. Ew nifşê ku ev derdana bi çavê serê xwe dîtibûn, dema ku ji wan dihate pirsîn; wek pirsa xwe kiribûne yek, bi axîneke kûr digotin ‘’heta qebrê jî, derdê oxirmê, ji bîra min naçe”

Dema ku Roma Reş li hember Ûris, şerê di sala 1877-78’an de winda dike û bajarên Qersê û çend cihên din, ji ber şer, ji wan re dihêle; bi hêrsa wê, li ser civakên ne misilman yên navxwe, zext û zordariyê zêde dike. Armanca wan ew e ku , ew civak ji welêt birevin.

Ji bo vê plana xwe, bi pergalî pêk bînin jî di sala 1881’ê de bi navê Alayên Hemîdiyan, hin rêxistinan ava dikin û berê canê civakên ermen û êzidî didin. Qurbanên van êrîşan yek jî, êzidiyên ji gundên Eyntabê (Dutaxa Qerekosê); li Mela Şemdînê, Hoxanê, Xanikê, Dêrikê, Tetikayê, Bedboriyayê, Esmerê û Sîncanê ne.

Ev êzidiyên Eyntabê, bêçare di payîza derengî ya sala 1882’an de, direvin û tên herêma Qersê. Rêveberiya Ûris a li Qersê, wan wê payîza derengî li ser gundên qeza Qaxizmanê ya nehiya Nexşanê, yên mintika Dîgorê belav dike. Hejmara civaka hatî 2090 kes e. Bi biharê re, wan li şazdeh gundên Dîgorê; Li Emançayîrê, Şîrînkoyê, Şatiroxliyê, Eyla Sinco, Êngukê, Sûsizê, Hesocanoyê, Dîgora Xerebe, Dûzgêçîtê Qizilquleyê, Qereqela Baro, Baceliyê, Kosesogitiyê, Qozilcê, Sîçanê û Taşnîka Çuxreşan cih dike. Bi tevahî 256 xane ne. Wek muhacir têne qeydkirin û sê salan ji wan bac nayê girtin. Debara xwe bi xwedîkirina heywanan û bi cotkariyê dikin. Ev civak ji Ûris re leşkeriyê nake, dewsa wê bacê didin.

Hemû gundên wan nêzî hev in û zozan in. Deşta zêrîn a Nexşanê ji çiyayê Zixçiyê dest pê dike, heya devê ava reş; bêhn û tehm û bereketa genimê kirik, “qeliya pezê qemer a ber berana” çetir e, mirov jê têr nabe. Ava çemê Dîgorê ya ku heft gundan bereketê berhev dike, tîne û ser erdê Êzdîxanê belav dike. Ava kaniya Warê Baso, Gomasolo, Kanisipiyê, Gevezê û sedên din, ne tenê tînê dişkênin, dermanê derdên bêderman in. Ji ber wê ye ji bîr nabin.

Êzidî li vî cih û warê bihuştî, li Serheda rengîn, mixabin tenê 36 sala dimînin, vê carê jî, şerê cîhanê yê yekem diqewime. Dewleta Romê û Ûris tên ber bi hilweşandinê ve diçin û civaka bê dewlet, êzidî bi fermaneke nû re, rû bi rû dimînin.

Li pey şoreşa 1917’an, Lenîn bê şert û bê şer, leşkerên Sovyetê ji Qersê dikişîne. Dewsa wan leşkerên Romê tên cih dibin, ermen û êzidî ber bi sînorên Sovyetê ve direvin. Lê Osmanî ku şerê cîhanê yê yekem winda dikin, çend mehan şûnda leşkerên Qerebekir ji Qersê dikişin. Hin ermen û êzidiyên reviyane şûnve tên ser hîmên xwe.

Di rêveberiya Qersê de valahiyek çêdibe; Şoreşa Sovyetê hêj xwe negihandiye Qafqasan. Qafqas xiloporte ye. Ermenistanê Taşnax serwer in. Ev dest diavêjin Qersê jî. Vê carê jî civakên misilman ji Qersê ber bi Erziromê, Bayburtê direvin. Qers ji ber destan diçe. Leşkerên Roma Reş û Taşnaxan û çeteyên girêdayî wan hetka civakan birandine. Civak bûye du parçe; misilman û ne misilman.

Cerda Şevoyê Qaçax a di gura Taşnaxan de, diavêje ser gundê Xuliyê û komkujiyê pêk tîne. Dîsa “Di sala 1918’an de çekdarên ermen dora gundekî kurdên misilman, gundê Sorxuliyê girtin, hemû rûniştvanên wê kirin gomê û agir bi wan xistin, hemû şewitandin. Pir mixabin ku hin kurdên êzidî jî beşdarî vê zilma giran bûn mîna piştgirên ermenan. Lê kurdên Sorxuliyê jî weke tê gotin ne am û tam bûn…”[2]

Dema ku ev tên bihîstin, gundên êzidiyan jî dibin hedef. Cerda Emerê Hingoyê Xinikê, ji alî Romê tê û davêje ser gundên ermen û êzidiyan.

Dema Ermenistan ji destê Taşnaxan dertê û dikeve destê Bolşevîkan, leşkerên Qerebekir tên û Qersê cara duyemîn hildidin. Ermen û êzidî cara duyem cih û warên xwe dihêlin û ber bi alî Tiblîsê, Gumriyê û Elegezê ve direvin.

Lê feyde nake mirin tê wan, li wan deran jî digire. De bila zimanê kevir û quçên gundê Camûşvana Mezin (Elegez) hebûna û yên bûyî bigotana; mezin dimirin û bi hezaran sêwî li dû wan dimînin, ji bo wan sêwiyan, li komarên Sovyetê, çendî çend sêwîxane tên vekirin. Ew zaran di wan sêwîxanan de mezin dibin. Ji bo bersivê bidin komkujiya hatiye serê wan, pir jîr û jêhatî tevdigerin.


Di salên 1930’an de Ronesansê di çand û wêjeya kurdî de didin destpêkirin. Casîmê Celîl Radyoya Rewanê dide avakirin li pey wî Xelîlê Çaçan, Ehmedê Gogê û Keremê Seyad pêşengiya Radyoya Rewanê dikin. Nûra Egîd Axa, Zeyneva Îvo û Eznîva Reşîd pêşkêşvaniya wê dikin.

Nivîskar û rewşenbîrên nemir: Erebê Şemo, Qanadê Kurdo, Heciyê Cindî, Emînê Evdal, Cerdoyê Genco, Ehmedê Mirazî û bi sedên din, wêjeya devkî berhev dikin, ji windahiyê xelas dikin û serpêhatiyên civakê bi formên wêjeyî dinivîsînin. Dibin, hişê civakî; pêşiya helandina civakê digirin û nemirbûna xwe diyar dikin.

“Lazim bê bigirin, xwe biperitînin, xwe bikelînin, xwe biqelînin, lê paşê bûyerên rojên derbasbûyî têkin kevirekî, wî têkin ber pişta xwe, mîna wî kevirî mehkem bin. Bila dijmin bi me nekene.”[3]

*1- Duaya serê sibê*
*2- Wezîrê Eşo, Kovara Nûdem, N 31, Rû 12, 1999*
*3- Ehmedê Hepo, Bawerî*









330x500 rupel 9+++:Layout 1 21.12.2019 14:32 Page 1 (Black/Black plate)



Xirbê Bawî

## Nasnameyê xopawitişî: Zazacîtî

Wisif Zozanî

Meseleyê nasnameyî meseleyêka newe ya û hîna zaf seserr a peyin de însanî pê eleqadar benê. Nasnameyê millî, dînî û cematkî ra tever newe nasnameyî zî vejîyayê. Hetê wiriştiş û rûniştişî ra bigêrîn hetanî dayiş û girotişî ya însanî wazenê xo pê nasnameyanê neweyan bidê şinasnayiş. Tayî nasnameyî xo ver ra viraziyayê, labelê tayê zî hetê şexsan ra nîyê pêra. Tayê ci rûniştî û miyanê şarî de ca girewto, tayin zî ri nêdî yanî qebûlê şarî nêdîyo yan zî hêdî hêdî bî vîn şî.

Nê rojanê peyinan de miyanê kurdan de newe nasnameyî peyda bîyê û teverê armancê xo de yenê şixulnayiş. Newşena newe de yew qisim vanê ma zazayê, kurd nîyê. Her yewê nê însanan xo gore sebebêk dîyo û nê sebebî ser ra îdiayê xo anê ziwan û dehwayê xo dima şinê. Ma pê nîyetê fam kerdişî goşê xo danê nê merdiman ma ewniyenê ke ciya ciya vengî la eynî ca ra yenê. Kam ke wazeno xo kurdîtî ra yanî nasnameyo dezavantajin ra bixelesno vano ma kurd nîye, ma zaza yê. Na zazatî zî viraştî ya feke de manena bêbinge ya û zuwa wa. Înan gore hama wa kurdîtî ra dûr bibê çi beno wa bibo. Nê dezayê ma?! wazenê pê komeleyan, pê kovaran ê zî nêbî pê partîyan!? heq û hiqûqê zazayan bipawê û biwazê. La yew çî hama ra zî mezgê înan de zelal nêbîyo, o zî kamî ra remenê û şinê xo erzenê kamî. Henzar derdan ser ra zî kamî hete de gerre kenê û şefqet pawenê. Şarî xo ra benê remcik, zerrê şarî xo, xo ra verdenê şinê xo erzenê bextê şarî binî.

Nê serranê peyênan de tayî oryantalistî çew vano qey sipariş ser o qalî kenê tê feke ra vanê zazayî kurd nîyê ziwanê zazayan eleqeyê xo bi ziwanê kurdan çinî yo. Zazaciyê ma yê feqîrê derberan zî vanê yew profesorê Ewropa wina vato yan zî zazakî ser o teza doktorayî kerda vano zazayî kurd nîyê. Oryantalîstan ra zafane yenê rojhilat û gêrenê çîyanê neweyan peyda bikerê. Eke peyda nêkirî o çax ê bi xo îcad kenê virazenê. Oryantalîstan ra yew giragir reyde des serrî vere cû ma Amed de niştê ro na mesele ser o qisê kerdî. Ê zî zirnawciyî zazaciyan kerdên û vatên zazayî Kurd nîyê Deylemî yê. Mi va lawo bê mirado delîlê to çi yo? Va nameye Dimilî û Deylemî manenê pê. Ez huyawa mi va şarê ma vano profosor profosor şima pê no qeyde benê profosor. Mi va çi ra Deylemî yê? Va çunkî Deylemî zî Elewî bî. Raşta zi no vate weşê zazaciyanê Dêrsimê şino. Mi va zazaciyê elewî to ca kerdê la zazaciyê sunnî tever de mendê. Va ê zî xo ca kenê vanê wa ma kurd mebo çi benê wa bibê!?

Merdim nê însanan vîneno fam keno ke tadayîya ke kurdan ser a bîya çiqas giran a. Ewladê nê şarî semedo ke nê zulim ra xo bixelesnî xo kurdîtî ra vejenê û sey nasnameyê xopawitişî zazacîtî kenê. Kurdîtî nika barêka giran a. Taqatê herkesî we nêdareno. Ê ke eşkenê, xo ver danê û nasnameyê xo pawenê. La ê ke nê eşkenê, xo rê nasnameyo viraştî virazenê xo pê zulim ra pawenê. No ride ra mi bin ê qeyda no nasname name kerd û va nasnameyê xo pawitişî.

Yew rey mi wîna yew mîsal viraştî bi. Yew zoolog o ewropayij şino dewêk dereyêk de cigêrayiş virazeno. No dere zî pê nameye Dereyê Qînceleyan namedar o. Zoolog o ewropayij dere de çi kerra dareno we binê ci de qînceleyo aşil/kesk vîneno. Binêna xebetiyeno peynî de bine yew kerra de yew qînceleyo zerd vîneno. Çendina heban vîneno vano; hah mi yew ganîyo newe dî! Dano ra şino Ewropa qonferans dano, beyanat dano vano mi yew ganîyo newe ca kerd. Ê ser o teza doktorayî zî nuseno û dima sey kitabî neşir keno. Mudeyêko der ra pey şarê a dewe ra yew merdim o tehsîlin ziwan museno rojêk raştê nê kitabî yeno. Ewniyeno behsê dewê ci têde est a û Dereyê Qînceleyan teferruat a behs beno. Zoolog o ewropayijî vato ewtiya de yew ganîyo newe ma ca kerdo. Merdim hêrs beno kitab xo dest ra vir keno, erzeno. Vano; la law no her o? Ganîyo newe ça de yo? O zî qînceleyê yo! Qînceleyê bin aşil ê û vengê înan binêna berz vejîyeno. Yê zerdî zî yew cins qînceleyî la binêna kêm ê. Vengê înan yê bînan ra binêna bari vejîyeno.

Tayê zazayan esl û cinsê xo began nêkenê wazenê eslê xo ra veji. Ê bi xo nê eşkenê xo rê esilêko newe bivînî. Şarî ra, xisusen oryantalistanê ewropa ra hêvî kenê. Yew merdimo ke xo reyde aşt nêbo kesî de zî aşt nêbeno. Ê ke paşt dane zazaciyan vanê şima sey ê bînan nîyê şima ciya yê şima holê, kes wa xo nê xapo! Çimê înan de qînceleyo qîncele yo. Ha zerd bi ha aşil ferqê ci çino!

# ‘Merkezkerdişê ziwanêk beno sebebê reaksîyonan’

Polîtîkaya vera kurdan her roje bi tewrêko bîn dewam kena. Gunduzî derheqê nê polîtîkayan de va: “Meclîs de kesêk nêeşkeno kirdkî yan zî kurmancî qalî bikero, la eşkeno sewbîna ziwanan qisey bikero. Merkerdişê yew ziwanî beno sebebê reaksîyonan.”

Nevîn Alkan




Wexto ke kurd yeno vatene xeylê hetan ra bêtehemmulîyêk yeno mojnayene. Tarîxî ra nata no wina bîyo û ewro zî eynî tewir dewam keno. Kirdî(kirmancî) zî perçeyê kurdan î, hemverê ziwan û kulturê înan de zî bêtehemmulîyêko pîl esto.

Tewr peyên Parlementerê Partîya Demokratîke ya Şaran (HDP) yê Çewlîgî Erdal Aydemîrî meclîs de kirdkî (kirmanckî) qisey kerd. Badê ke Aydemîrî dest bi qiseykerişê xo yê kirdkî kerd, maseyan ra reaksîyonî ameybî nîşandayene û parlementerî waştî qiseykerdişê Aydemîrî asteng bikerî. Parlementerî maseyan ra qîrayî ke va Serekwekîlê meclîsî Levent Gokî, Aydemîrî îqaz bikero û qiseykerdişê kirdkî (kirmanckî) bido birnayene. Derheqê bêtehemmulîya kurdkî, rewşa kirdkî (kirmanckî) û kirdan de nuştox Denîz Gunduzî qisey kerd.



**‘Wazenê kurdan bikerî tirk’**

Nuştox Denîz Gunduzî destpêkê qisyekerdişê xo de wina va: “Dewlete her çiqas vaja ma polîtîkayê asîmîlekerdişê kurdan ra fek veradayo; aye ra tepîya tay unîversîteyan de beşê ziwanî akerd û TRT 6 akerd zî polîtîkayê dewlete yê derheqê kirdkî û paradîgmaya ci nêvurîyayê. Aye ra meclîs de vera kurdkî de reaksîyonê winasî normal î. Naye ra goreyê sîyasetê înan zaf normal o ke meclîs de vera kirdkî (kirmanckî-zazakî) û kurmancî reaksîyonî winasî bibî. No girêdayeyê sîyasetê kurdan o. Yew paradîgma çin o. Wazenê kurdan asîmîle bikerî û bikerî tirk. Qanûno bingeyîn de zî xora pêroyê hemwelatî sey tirk yenî hesibnayene. Aye ra nê reaksîyonê ke vera kirdkî benî, zaf noral î. Naye ma rê nîşan dano ke dewlete polîtîkayanê xo de zaf huşk a.”

**‘Kitaban vetî û ser kewtî’**

Gunduzî dewamê qiseykerdişê xo de bale ant polîtîkayê vera kurdan û wina dewam kerd: “Nika meseleya kirdkî goreyê yê kurmancî hêna têmîyankerde ya. Çi kirdkî bo çi kurmancî bo ferq nêkeno, kurdî hetê dewlete ra ameyo qedexekerdene. Kultur û ziwanê ma ser de tedayêk esta. Mîyanê kurdan de polîtîkaya ziwanêko serûber çin o. Heta ewro zî hareketê sîyasî yê kurdan başur de dormeyê soranî de, vakur de zî dormeyê kurmancî de xo kerdo merkez. Hereketê sîyasî yê kurdan belkî 20 televîzyonî akerdî, la pêro kurmancî weşanê xo kerdêne. Tena yew kanalo kirdkî ke ceribnayî akerî ame padayene. Yanî na rewşe kirdkî kena dereceya diyîne. Aye ra kirdkî sîyasetê zerrî yê mîyanê xo de zî zaf zirar vîneno. Vakur de kurdî seke tena kurmancî bo yeno hesibnayene. Başur de zî seke tena soranî bo. Nê serranê peyênan de vurîyayîşê girdî bîyî. Kurdî ferq kerd ke wina nêbeno û sîyasetêko merkezkerdişê yew ziwanî beno sebebê reaksîyonan. Aye ra ê sîyasetê xo ra fek veradayî. Ronşvîrê kirdan bi kirdkî zaf weşanî û kitaban vetî û ser kewtî. Polîtîkayêka ziwanî dayî xo ver û ser kewtî. Na rewşe zî tesîrêko pozîtîf viraşt. La kirdkî goreyê kurmancî nê polîtîkayan ra hîna zaf zirar vîneno.”

**‘Qedexe hema zî dewam keno’**

Gunduzî qiseykerdişê xo donma û va: “Statuyê kurdî bi xo mîyanê kurdan de nizm o. Dewlete bi xo no ziwan qedexe kerd û belkî ewro no qedexe qismêk warişt. La hema zî ziwanî ser de teda esta. Tay gaman eştî la polîtîka eynî ya. Meclîs de kesêk nêeşkeno kirdkî yan zî kurmancî qalî bikero, la eşkeno bi ziwanê îngilîzî, erebî û sewbîna ziwanan qisey bikero. Çimkî derheqê kurdan de polîtîkaya dewlete esta. Wazena ke kurdan bikera tirkî. Sebebê înan ê ekonomîk û sîyasî estî. Aye ra seba ke kurdî hîşyar nêbî û nêbî netewe, ganî înan asîmîle bikera û bikera tirkî. Nika raşt o kirdkî merheleyêko ver bi vindîbîyayîşî de yo. Kesêk domananê xo nêmusneno zazakî. Eke wina dewam bikero ziwan mireno. Sîyasetmedarê kurdî kurdkî tena sey hacet vînenê ke vera tirkdan de niburno vajo şima ziwanê ma qedexe kerdo. Ê sîyasetê xo tirkî kenê. Selahattîn Demîrtaş bi xo zî kitabanê tirkî nusneno. Wexto ke Selahattîn Demîrtaşî bi xo kitabanê tirkî nuşt, şar mîyanê sîyasetê kurdan de nê çîyan vîna, do vajo qey ez domananê xo nêmusna tirkî. Tirkî hêna muhîm o û nê sîyasetmedaran xo rê nimune bigîro. Na babete de tena xeta yê dewlete nîyo. Ganî ê ke îradeyê kurdan temsîl kenî qîmet bidî ziwan.”

**‘Çimkî dewayêka înan çin a’**


Gunduzî dewamê qiseykerdişê xo de dîyar kerd ke ganî sere de pozîsyonê kurdkî baş bêro famkerdene û wina dewam kerd: “Dewlete bîlasebeb ziwanê ma qedexe nêkena. Çira qedexe kena, çimkî welatê ma binê destê înan de yo. Wazena ke heta peynî îdare bikera û binê kontrolê xo de vera bida. Seba dewlete yeno mehneya berêko ekonomî. Coka ra nêwazena ke welat destê aye ra bivejîyo. Wayîrê nê welatî zî kurd î û ê nê welatî de cuyenî. Aye ra wazena qet nêbo kurdan asîmîle bikera û kurdî ferqê heqanê xo de nêbî. Xo sey sewbîna mîletêk nêvînî û welatê xo sey sewbîna welatêk nêvînî. Tirkîya de nika erebî estî, ziwanê ereban serbest o. Çimkî dewayêka înan çin a. Eke kurdî sewbîna welatan de zî dewaya welat û ziwanê xo bikerdêne do reyna raştê nê tedayan biameyêne.”

**‘Xo pabesteyê kurdan nêvînenî’**

Gunduzî da zanayene ke mîyanê komelê kurdan de kirdî ke xo girêdayeyê komelê kurdan nêvînenî estî û wina donma: “Tay kirdî estî ke xo pabesteyê komelê kurdan nêvînenî. No reaksîyonêk o. Sebebê nê reaksîyonî o yo ke sîyasetê kurdan seba ke kurmancî kenî merkez û heme organîzasyonî giranî danî kurmancî û kirdî teberê rojeva xo de veradanî, reaksîyon dîyeno. O se beno; tay kirdî werizenî vanî ma zî kurd nîyî. Sebebêko bîn zî o yo ke sîstem wazena kirdan kurdan ra cîya bikera. Sîyasetêko klasîk dinya de esto ke parçe biker û îdare biker. O zî no sîyaset o. No sîyaset nika ramena.”

**‘Kirdî û kurmancî ferq nêkenî’**

Gunduzî peynîya qiseykerdişê xo de qala tesîrê polîtîkayanê vera kirdan kerd û wina va: “Nika polîtîkayê vera kirdan û kurmancan cîya nîyî. Nê kurd ê. Xora înan xo rê dişmen vîna. Estbîyayîşê înan xo rê tehluke vînena.Wexto ke qedexe bikera, kirdî zî qedexe yo kurmancî zî. Kirdkî rê muameleyêko xusust heta ewro nêameyo kerdene. Tena paştî dana zazacîyan ke quwetê kurdan vila bikera û perçe bikera. Pêroyê sîyasetê xo, nê bingeyan ser o ramnena. Aye ra çi kird çi kurmanc ferq nêkeno û sîyasetê xo domnena. Arşîvê tarîxî de zî, cumhurîyetî, raporê şarqî û bi hezaran dokumanî estî ke dewlete ra ferq nêkeno û sîyasetê aye zaf akerde yo û zelal o. Nîyet o yo ke înan werte ra wedarna.”






# Hewceyî doktor nake

Hevalno gelek name ji me re tên û tev derbarê derûniya xerab a mirovan de ne. Ji ber ku şert û mercên jiyanê gelekî dijwar û zehmet bûne derûniya mirovan tevlihev bûye. Xwedê ji kûçiklojiya zordestan re nehêle ku em xistine vê rewşa xerab.

Lê qet meraq nekin doktorê me yê hêja ê pisîkolog (derûnas) mizgîniyek xweş daye me . Dibêje normal e ku mirov bi dîwaran an bi daran re an jî bi siya xwe re biaxive. Lê di heman demê de hişyariyekê dide û dibêje kengî we dît dîwar bersiva we da, wê gavê nexweşiya we giran bûye divê hûn werin ba min.

Li gorî agahiyên doktorê me piraniya nexweşên ku di dema dawî de serdana wî dikin mexdûrên buhabûna ceyranê ne , xwedê ji rêxistina DEDAŞ'ê re nehêle dîsa buhayê elektrîkê zêde kir.

# Hûtê heft serî

→ **DILDARÊ AMEDÊ**

Xwendevanên hêja kurd jî wekî gelek neteweyên din bi taybetî jî dayikên kurd di warê lorandina zarokan de bi rêya çîrokan xwedî çandeke dewlemend in. Bi taybetî di demên berê de ku televizyon, kompîter, tablet û telefon tune bûn dayikan ji bo ku zarokên xwe têxin xew çîrok ji wan re digotin.

Dema kurê min Ronî biçûk bû çîrokên biçûkiya min bala wî dikişandin û dema min jê re got diya min bi şev ji me re çîrok digotin wî jî bi baldarî li min guhdarî dikir. Wiha êdî ji ronî re bibû kurm, beriya ku razê divê min çîrokek du çîrok jê re bigota. Gelek caran min sê çar çîrok digotin heta ku di xew re diçû.

Şevekê min dît Ronî bi şev ji xew rabû û wekî dînan bêyî hişê xwe diaxive û ji tirsan diricife. Ez gelekî tirsiyam, min hewl da ku wî bînim ser hişê wî û min jê re got netirse ew xewn e. Bi zor û heft belayan min ew hinekî anî ser hişê wî.

Roja din ez gelekî fikirîm gelo çima ev zarok wiha tirsiya, paşê di nav axaftina wî de min fêm kir ku sedema tirsa wî çîrokek min e. Dema min jê pirsî te çi di xewna xwe de dît, got gur dihat ku min bixwe.

Min fêm kir ku sedema tirsa wî çîroka Şengê û Pengê ye ku di wê çîrokê de ji alî gur ve tên xwarin. Êdî min hewl da ku wê çîrokê di serê wî de bidim guhertin û min hinekî ew çîrok guhert û ne bi şev lê bi roj û bi rengekî guhertî, jê re wê çîrokê got.

Ew beşa di çîroka Şengê û Pengê de dibêje: gur hat şengê û pengê xwar, min guhert û got Şengê û Pengê bi xwe re birin. Lê tevî wiha jî min nikarî ku wê tirsê ji serê wî derxînim û heta demeke direj di xew de ditirsiya .



Îcar min xwest ez vê serpêhatiya xwe bi we re parve bikim. Dê û bavên ku ji zarokên xwe re çîrokan dibêjin divê bi baldarî wan çîrokan hilbijêrin, an na dibe ku li şûna zarokên wan xewnên xweş bibînin ew bitirsin û pîrevokan di xew de bibînin.

Wek nivişta mele li serê min û Ronî hat. Bawer im gelek ji we vê çîrokê dizanin û ji bo kesên nizanin bi kurtahî çîroka nivişta mele dibêjim.

Dibêjin carekê zarokekî bi xwe de mîz dikir û diya wî çû ba meleyekî û jê re got ji kurê min re nivişteke çêbike da ku êdî bi xwe de mîz neke. Piştî ku mele nivişta xwe bi kurik vekir êdî kurik ne tenê mîz, êdî bi xwe de gû jî dikir.

Diya kurik vegeriya ba mele û jê re got Seyda, beriya nivişta te kurik bi xwe de mîz dikir niha bi xwe de mîz jî dike û bi xwe de dirî jî, mele ji bo xwedê tu kurê min vegerîne qeysa berê.

Êdî ji bo wekî nivişta mele li we neyê ji kerema xwe baldar bin û çîrokên hûtê heft serî, pîrevok û gurên har beriya xewê ji zarokên xwe re nebêjin.

Ne ev çîrok tenê, gelek çîrokên kurdan ên bi vî rengî hene, wekî çîrokên hûtê heft serî, gurê manco û her wiha gelek çîrokên din...



# Çîroka şeytan û mirovekî ji Sûriyeyê

Şeytan di guhê yekî sûriyeyî de kire piste pist;

***Şeytan:*** Li otombîla xwe siwar bibe û dengê mûzîkê hilde, bila kêfa te were cih.

***Sûriyeyî:*** Otombîla min tune ye.

***Şeytan:*** Televizyonê veke û li stranan guhdarî bike.

***Sûriyeyî:*** Elektrîka min tune ye.

***Şeytan:*** Here meyxaneyê û têra xwe vexwe û kêf bike.

***Sûriyeyî:*** Pereyê min tune ye.

***Şeytan:*** Mala xwe bifiroşe û ji xwe re kêfa xwe bi wan pereyan bike.

***Sûriyeyî:*** Mala min kirê ye.

***Şeytan:*** Here diziyê bike.

***Sûriyeyî:*** Derdora min tev wek min zelût in.

***Şeytan:*** Tu zanî istixfara xwe bînî?

***Sûriyeyî:*** Erê dizanim.

***Şeytan:*** De zû eşed û istixfara xwe bîne da ku ez ji vir biqeşitim, tu xêr di te de tune ye, te kezeba min werimand û li min heram be ku careke din werim ba te.

330x500 rupel 11+++:Layout 1 21.12.2019 14:30 Page 1 (Black/Black plate)



# Xeyalên şêwekareke 16 salî

Şêwekara zarok Zeyneb Osman, bi temenê xwe yê ciwan hest û xeyalên xwe bi xêzkirina wêneyan îfade dike. Zeyneb Osman diyar kir ku ew bi xêzkirina wêneyan êş, têkoşîn û dîroka jinan tîne ziman û bi vî rengî derdixe pêş

**Hesna Muhemed /** ŞEHBA

Li cîhanê her mirov bi rê û rêbazên cuda hestên xwe tînin ziman. Hin kes hene bi muzîkê, hin kes bi strangotinê, hin kes bi helbestan, hin kes bi xêzkirina wêneyan û hwd. xwe digihînin civakê û bi vî rengî dibin hest û hizrên civakê.

Yek ji van kesan jî Zeyneb Osman a 16 salî ye. Zeyneb Osman ku ji navçeya Raco ya Efrînê ye û niha li gundê Xurnada ya Şehbayê bi cih bûye, hestên xwe bi xêzkirina wêneyan parve dike. Di her wêneyên Zeyneb Osman ku tevî ji neçariyê ji cih û warên xwe bûye, neqşeke cuda heye. Wênesaza biçûk tevî koçberiyê jî dev ji xêzkirina wêneyan bernedaye û her kêliya jiyana xwe û hemû hestên xwe li ser pelên spî bi xêzkirina wêneyan tîne ziman. Xêzkirina wêneyan ji bo Zeynebê rê û rêbazeke têkilîdanînê ye. Di her wêneyên wê de hesteke cuda heye. Di wêneyek wê de êş hebe, di wêneyek wê yê din de jî têkoşîn û dîroka jinan û civakê heye.









**Mereqa li ser xêzkirinê**

Zeyneb têkildarî wêneyên xwe axivî û meraqa xwe ya li ser xêzkirinê wiha anî ziman: "Di temenekî biçûk de meraqa min li ser xêzkirina wêneyan hebû. Bi xwesteka xwe ez fêrî xêzkirina wêneyan bûm. Hezkirina min a neqişandina wêneyan gelek e. Her wêneyekî li gor hest û fikrên xwe xêz dikim. Niha jî malbata min ji bo xêzkirina wêneyan pişgiriyê dide min, ev yek jî min kêfxweş dike."

**Wêneyan diyarî dide**

Di axaftina xwe de destnîşan kir ku ew bi wêneyên xwe tev li pêşengahê bûye, di pêşengahê de bi ser ketiye û wiha domand: "Ez yekem car tev li pêşengeha xwendekarên Efrînê bûm û bi ser ketim. Piştî ez li pêşengehê bi ser ketim min hêz girt û meraqa min a li ser xêzkirina wêneyan zêdetir bû. Çi çalakiyên wênexêziyê hebin ez beşdar dibim û wêneyên xwe diyarî jî didim."


**Xwe digihîne civakê**

Zeyneb diyar kir ku wêneyên wê li ser dîrok, berxwedan û êşa jinên kurd e û wiha pêde çû: "Wêneyên min piranî li ser êş, berxwedan û dîroka jinên kurd in. Ez her tim dixwazim êşa jin û çîrokên wê derxim pêş."

Her wiha Zeyneb xwest ku her zarokek li gel xwendina xwe ji xeyalên xwe re jî demê veqetîne û bi xeyal û wêneyên xwe bigihînin cîhanê.

---

## Mertal



**Selîm Temo**

## ii. dengê heyva…

Dengê heyva li ser golê me îşev
gava xwîn diçe ji bejna spîndarê
olan e, dipişkive li Payîza demê
gava bêjî were li qeracê dayne
gava dêwên hesinî biçêrin li peravê

rengê heyva li ser golan im îşev
va ye gul tinim ji kaniyên devxwar
av şil dibe ji hilma guldexwînê
guppe gupa dilê olanê ye êdî
bila biçirûse heyhedana gulavê

çengê heyva li ser golê me îşev
dirazêm di eyarê guran de
dem dipişkive ji nîveka demsalê
dilûse salûla şevê, bêje hawar
bêje werin kulavên xewnan
em ê govendekê lêxin

bila binale asmên li kendalê sûlavê

Helbestek ji dosyeya bi navê "Hilbe Kobanî"ya Selîm Temoyî.

---

## Çiya Mazî du pirtûkên nû nivîsandin

Nivîskar M. Çiya Mazî, du pirtûkên nû, 'Tebatî' û 'Bayê Zewêdiyan' li berhemên xwe yên çapkirî zêde kir. Pirtûk ji weşanxaneya Berbangê hatin derçûn. Tebatî; pirtûka wî ya çîrokan a 5'emîn e. Çîrokên vê pirtûkê ji bûyerên rastiya jiyanê sûd werdigirin û wek rêzeçîrokan di pirtûkê de cihê xwe digirin. Bayê Zewêdiyan pirtûka helbestan ya M. Çiya Mazî ya sêyemîn e. Nivîskar di helbestên xwe de hesreta welat, kesatên civaka kurd û bendemana serkeftinan nivîsandiye. ***AMED***

---



**Weswese 2**

**Şener Ozmen**

## Di demên ciyawaz de...

*Merheba xwînerên delal.*

Bi boneya nivîsandina ji rojnameya Xwebûnê ya heftane re, ez jî bi kel û bîn vegeriyam salên xwe yên 'nirxandin' û 'rexnegirî'yê ku piraniya wan ji gotar û nivîsarên min yên peywendîdarî Hunera Hevçax (Contemporary Art) û kar û barên hunermendên kurd pêk hatibûn û beşek jî jê, deq û nivîs û xwendinên min ên derheqê Wêjeya Kurdî Ya Nûjen de bûn ku di kovar û rojnameyên wê demê de -exleb ji di pirtûkçeyên pêşangehan de- hatibûn weşandin. Divêt ji niha de bibêjim -bi vê yekê re jî bexşa xwe dixwazim- wekî hemû ew nivîsana, bi demê re, wek pirtûk jî der çûbûn, mixabin bêhtir bi zimanê tirkî bûn, wek; Travma ve Islahat (Trawma û Çakkirin, 2007), Uykusu Bolunenler (Yên Xew Li Wan Herimî, 2013) û Sevişen Kurgular (Honakên Ku Pevşa Dibin, 2016).[1] Di vê vegerê de li ser van mijarên 'tenik' pirsa 'Aya herî dawî min li ser çi nivîsandibû?' jî derketibû mexderê û pirsa ku li pey dihat jî ev bû; û ji bo çi? Ji ber hindê ku îro ro peyva Hunera Hevçax, ji bo wan hunermendên ku kêşeya bûjenê (kereseyê) ne bi rêyên tradîsyonel an jî konvansiyonel, lêbelê bi rêyên qaşogiravî azad û bi bîr û boçûnên qaşogiravî jê azadtir û bi bixwebaweriyeke bêsînor bi kar tînan -û tînin- ku mebest ji vê yekê ji pevgirêdana bo bazarê (marketing) ye, tê bikaranîn. Hunera ku bi tîpên girdek dihat nivîsîn, ji serî û heya dawî guherî, helbet hest û nestên hunermandan jî! Berê formulasyonên ku ji sedsala borî hatine jiberkirin, her li bazara hunerê ye, CEO'yên şirikeyên navneteweyî ketin dewsa rexnegirên hunerî. Ku herî dawî me enstelasyona hunermendê îtalî Maurizio Catellanî ya ji mûzeke ku bi banda ambalajê bi diwarê şirspî yê galeriyê ve hatibû zeliqandin pêk dihat, dît. Beriya Catellanî jî enstelasyonên bi heman rengî ji layê hin hunermendên ku temet Catellanî ne navdar û bextçê bûn, hatibûn lidarxistin û hemûyan de tişteya sereke mûzeke pornografîk bû. Adriana Lara (Banana Peel, 2008), Ivan Sikic (Good Morning Miami, bi qartolê, 2019).

Belam gava gotin tê ser kurdan, îro, peyva -yan ji em bibêjin têgiha- Hunera Hevçax, ji bo neteweyeke ku şerê man û nemanê dide tê çi wateyê, kar û barên ku li jêr hevçaxiyê têne lidarxistin û pêşengehên ku bi van etîketan li bajarên kurdan -xasma jî li Amedê û Mêrdînê- têne vekirin, ji bo kurdan çi ye ne çi ye, mixabin çi lêkolînên bi rêk û pêk nîn in wekî em karibin tevayiya wêneyê bibînin. Di qada siyasetê de ne Hunera Hevçax û ne jî Wêjeya Kurdan, fenanî pirs û pirsgirêkên 'girîng' nehatine dîtin. Dibêm qey min di hevpeyvîneke xwe de gotibû wekî li Amedê û li Mêrdînê jî Hunera Hevçax bi ziman û bi hiş û hoşeyê mêtingeriyê tê birêvebirin.

De êdî çi be, di Uykusu Bolunenler'ê de nivîskarên wek Dilawer Zeraq, Kawa Nemir, Amed Çeko Jiyan, Heciyê Cindî, Îrfan Amîda, Osman Sebrî, Qedrî Can, Nûredîn Zaza û Yaqob Tilermenî cî girtibûn, ku hinek ji wan di formata hevpeyvînê de bûn, hinek xwendin û hinek jî wergerên min bûn. Min kurtebeşek ji Hewariya Heciyê Cindî wergerandibû û kurtebijarteyek ji pirtûka Mele Mehmûdê Bazidî jî, ji Adat û Rusûmatnameyê Ekradiye'yê wî.

Çaxa pêşniyaza nivîsandina li ser wêjeya kurdî ya ji bo Radîkal Kîtap'ê di Şêstemîn Fûara Pirtûkan a Frankfurtê (2008) de ji aliyê Cem Erciyesê Gerînendeyê Hunerê yê Rojnameya Radikalê hatibû kirin û pirsên peywendîdarî vê mijarê jî arasteyî min bûbûn de, Serokomarê Tirkiyeyê yê berê Abdullah Gul û romanûsê tirk ê Xelata Nobelê wergirtî, Orhan Pamuk jî bi boneya ku Tirkiye wek Mêvanê Rûmetê hatibû hilbijartin, axaftinek li dar xistibûn. A soxîn, Pamuk, di derheqê rewşa nivîskarên muxalif û zilm û zora ku li wan dihate kirin de, bîr û boçûnên xwe parve kiribûn, bi berteki-yeke ku tepeserî çanda tirkan bi paş de biriye. Axirî soxirî, ji ber kar û barên min ên hunerî, hingê min bexşa xwe ji Cem Erciyesî xwestibû wekî ez neşêm heftane li ser Wêjeya Kurdî binivîsim, piştî demekê, ango piştî Abidin Pariltiyî, ev erka han dîsan hatibû û li min vegeriyabû, min jî navê quncika xwe danîbû Weswese; min bi Ciwanmerd Kulekî dest bi nivîsarên xwe kiribû, dû re Ferhad Pîrbal, Amed Çeko Jiyan, Lokman Ayebe bûbûn mêvanê xwendinên min. Bêguman min dixwest bidomînim, belam bo min qewî zehmet bû; di henga nivîsandina nivîsara wê hefteyê de, diviya ku min dest bi xwendina romaneke din jî -ji bo hefteya bê- bikira û ez tênedigihiştim wekî quncinivîskarên ku rojane dinivîsin, çawan û bi çi teherî ji heq derdiketin. Tişta ku dilê min ji nivîsandinê sar kiribû, ne veguherîna rojnameyê bû, naxêr, Radikal weşana xwe dabû rawestandin, belam pêveka wê ya pirtûkan, dê bi Hurriyetê re derketa, pirsgirêka min jî ev bû.

Qaşogiravî nivîsara min a dawîn dê li ser Cîm û Gulperiya Seydayê Cegerxwîn bûya, tew min dest pê jî kiribû. Di vê kurteromanê de anomaliyên seyr ên weke navcîgehiyê, nakokîyên demî, têperî û pengizînên ku ez şaş û metel dihiştim hebûn ku heman tişt (hêmaya xewn û berxewnan, lêbelê reng e ku ev yeka han jê wêdetir e), di Destana Memê Alanî (Mem û Zîn) de jî derdiketin pêşiya min. Ya ku Sadiq Bahaeddîn Amêdî, di berhema xwe ya bi navê Folklora Kurdî [2] de , ji dengê Seîdê Pîroyî (35 salî), xelkê gundê Darhozanê qeza Zaxo, di sala 1975'î de tomar kiribû.

Me li ser demê anî, di pirtûka bi navê Jiyaneke Li Pey Zanyariyên Kurdî - Kurdolog Prof. Dr. Celîlê Celîl a ku ji aliyê Nihat Gultekînî ve hatiye amadekirin de, Celîlê Celîl çaxa bersiva pirsa Necla Morsumbulê dide, tîne dibêje; 'Ji bo kurda ew dem e. Tiştê mezin bêyî ku em texmîn bikin em winda dikin, ji me diçe, ew dem e. Dewlet demê ji me didize, di nav demê de kurdbûnê di hela-bela jiyana her rojî de diheline. Her roj dengbêj, stranbêj, zanayên zimanê kurdî, çîrokbêj dimirin, ji me xerîb dibin û zanîna zimanê kurdî bi xwe re dibin gorê.' [3]

Dewlet demê ji me didize… çi gotineke ezamet e! Herçî em in, em bi melkemotên xwe re heman demê najîn, bi hêviya Wesweseyên bê…

***1 - Pirtûkên navborî ji Weşanên Lîsê derketibûn.***

***2 - Folklora Kurdî, Sadiq Bahaeddîn Amêdî, Weşanên Lîsê, 2013.***

***3 - Jiyaneke Li Pey Zanyariyên Kurdî- Kurdolog Prof. Celîlê Celîl, Nîhat Gultekîn. Ji hevpeyvîna Necla Morsumbulê, r. 193, Weşanên Lîsê, Îlon 2019.***

330x500 rupel 12+++:Layout 1 21.12.2019 14:27 Page 1

xwebûn

23-29 Kanûn 2019/ e-mail: rojnameyexwebun@gmail.com / Buha: 4 TL Hejmar: 1


***İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:*** Kadri Esen
***Sorumlu Yazıişleri Müdürü:*** İdris Gürmez
***Yayın Danışma Kurulu:***
Abdulla Peşêw
Ehmed Huseynî
Kakşar Oremar
Prof. Knyaz Îbrahîm Mîrzoyev
Selîm Temo
Dr. Zerdeş Haco

***Yönetim Yeri:*** Kooperatifler Mah. Gevran Cad. Akkoyunlu No: 5/13 ***Yenişehir / Diyarbakır***
***Baskı:*** Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı ***Bağlar / DİYARBAKIR***

# Warê ku dîrok jê dizê: GIRÊMIRAZA

Keştiya Alalû

**Agît Yazar**



Girêmiraza, mejiyê mirovan bi pirsên bê bersiv dagirtiye. Herkes ji hevdu dipirse û pirsên xwe bi pirseke din dibersivîne. Bi vî awayî gidîşa pirsan mezintir dibe, lê bersiv zîro! Di vê xalê de ez jî dixwazim pirseke ji wan pirsên dînan bipirsim û hinekî din mejî tevlihev bikim: Gelo hinek kesan ji şarsitaniyeke ezmanî ango fezayiyan hatin xwe nîşanî niştecihên li derdora Girêmiraza dan û piştî hingê wan mirovan dest bi avakirina van perestegehên hanê kirin? Mejî tam bû çeqilmast, ne wilo? Heta mejiyê meriv baş tevlihev nebe, zelal jî nabe! Binêrin. Bi rêya empatiyeke gelekî pêşketî, encax meriv dikane hinekî miraz û mexsedên wan însanên hanê yên 12 hezar sal beriya niha hinekî fam bikin. Heke ne ji bo armanceke pir, pir, pir, pir û pirrrrr mezin be, gelo kî dikanîbû wan mirovên hingê yên nîvkovî wanî wan organîze bike, bi wan kevir bi keviran bide birîn û kevirên 30 ton giraniya wan e, biterişîne û her wiha têêê nizanim ji ku bîne û bi awayekî estetîk li Girêmiraza biçikîne? Binêrin! Heta vê derê me hevdu bi pirsên bê bersiv hilajot. Her çend me hewl da em pirseke xwe bibersivînin jî, ew bersiv jî bû zir-pirsek û derket pêşberî me.

Pirsên me di derheqê çi de bû? Helbet di derheqaê avakirina perestgehên Girêmiraza de bû. De vêca piştî hezar û pênçsed salî, bi destê heman kesan, sernuxwumandina van perestgehan jî, ew çend giloka pirsan mezintir dike. Avakirina van perestgehan derdek, sernuxwumandina wan jî derdên di ser derdan re ye!...



**Ajalên li ser stûnên çikandî**

Em pirsên xwe yên li jor ku bersivê li xwe vediguhezîne pirsê, li wir bihêlin û em werin li ser rewşa Girêmiraza ya niha ya berbiçav:

Tevahiya rolyefên li ser kêlber ên çikandî, meriv matmayî dihêlin. Lewra temamên wan rolyefan, bi sêwirandineke hostane hatine niqirandin. Lê çar heb rolyef henin, lêkolîner herî pir li ser wan disekinin. Çaxa meriv nirxandinên li ser van rolyefan tên kirin dixwîne, bi rastî jî meriv vediheje û di bîreke bê binî de wer dibe. Ez dixwazim hema di ser re qala van her çar rolyefan bikim.

Yek: Kevirekî qul î bi çember e. Du:Teyrê Sîsalk, ango Teyrê Keçel ê laşxwur e. Sisê: Teyrê Dodo ye. Çar: Jinek e ku çeqê xwe ji hev vekirî ne û zaroka xwe tîne dinyayê.

Ev rolyefên hanê, gelekî eşkere ye ku bi mebesteke taybet hatine sêwirandin.

Em werin ser sêwirandina rolyefa jina zaroka xwe tîne dinyayê: Ev sêwirandin a hanê, yekser girêdana xwe bi navê "Girêmiraza" re heye.

Du sal berê ez çûbûm ser Girêmiraza. Kalemêrek li ber devê derî bû. Ji qerta di hustuyê wî de diyar bû ku ew berpirsiyarek e. Gava ez nêzîkî kalemêr bûm, min têderxist ku ew Mahmûd Yildiz e. Mahmûd Yildiz, ew kesê xwediyê wê zeviya ku perestgehên Girêmiraza di nav de hatibû dîtin bi xwe ye. Mahmûd Yildiz, rîspiyekî ji wan rîspiyên ji dem û dewranên berê, ku meriv digot qey ji nav çîrokek mîtolojîk pekiyaye û derketiye pêşberî min.

Mîna ez nêzîkî kesek ji wan kesên mabedên Girêmiraza avakiriye, nêzîkî wî bûm. Dema apê Mahmûd Yildiz pirsên min dibersivandin, ez geh diçûm 12 hezar sal beriya niha, geh jî vedegeriyam wê kêlîka ez tê de bûm. Hesteke pir cuda bû.

***Apê Mahmûd Yildiz digot:*** "Ji ewila ewil ve darek tûyê li serê vî girî hebûye. Ew dar û derdora wê, cihê ziyaretê bû. Lê rojek tê ew dar hişk dibe. Hingê xalê bavê min radibe di dewsa wê darê de, dareke din a tûyê diçîne. Lê ev dar jî li ber hişkbûnê ye. Hema hema emrê vê darê jî nêzîkî sed salî ye. Dema berê, debara me tenê li ser sewalvaniyê bû. Pezên me jî pir bûn. Her sal kalikê min pezek li bin vê dara tûyê ya li ser Girêmiraza serjê dikir û xwarin datanî. Wekî din jî ji herêmê xelk ji bo şifayê bibînin, an jî ji bo zarokên wan çêbibin, wan jî pez serjê dikirin, xwarin datanîn û ji xwe re li ber xwedê digeriyan..."

Hemû gewdeyê min seraping bûye cotek guh û ji bo sêra wê kêlîka bi raz xera nebe, ez qet napeyivim û hema hew ez ji xwe re li apê Mahmûd guhdarî dikim. Apê Mahmûd pêde diçe û peyvên xwe, nola hebikên morîkên tizbiya di destê xwe de berdide ser hev:

"Tu wer e ji xwe re li îşê xwedê binêre! Çend metre fireyî darê, hêkelê jineke ku zaroka xwe diwelidand derket."

Ez di cihê xwe de sar cemidîbûm. Careke din ez ditûriskîm û diçim 12 hezar sal beriya niha. Gotinên apê Mahmûd di guhê min de dizinge û olan dide; dara tûyê ya ziyaretê, dua, jinên zarokên wan çênabin, hêkelê jineke ku ketiye li ber gede... Na, na! Teqez ez di xewnekê de me! Ji bo ez vê xewna xwe baş bi ruh bînim û ji we re vebêjim, divê dîsa ez bi trûskandinê vegerim vê kêlîka me ya niha.



## Teyrikê Dodo û Teyrê Sîsalkê

Nivîskarê dîrokê yê navdar, Andrew Collins balê dikişîne ser rolyefa sêwirandina teyrê Sîsalkê, teyrikê Dodo û efsaneya Ferîşteyên sergumkirî yên di kitêba pîroz Hanokê de tê qalkirin. Her wekî tê zanîn ev teyrikê Dodo, beriya niha 300 sal berê nislê wî qelihiye. Dihat bawerkirin, ev teyrikê Dodo tenê li girava Madagaskarê jiyaye. Lê li gorî niştecihên Girêmiraza ev teyrikê Dodo li ser kêlberan/stelan sêwirandine, ev teyrikê hanê li vê herêmê jî jiyaye.

Ez dixwazim hinekî qala teyrikê Dodo bikim: Mezinahiya vî teyrikê Dodo, bi qasî metreyekê bûye. Bîst kîlo giraniya wî hebûye û herwiha ji ber baskên xwe yên gelekî kurt, nikanîbûye bifire. Hûn dikanin bibêjin êêê, vêja çi eleqeya teyrikê Dodo û Ferîşteyên sergumkirî bi hev heye? Eleqeya wan a bi hev dikeve ev e: piştî cezakirin û sergumkirina Ferîşteyên sergumkirî, mafê wan ê firandinê jî ji destê wan hatiye girtin. Da ku nikanibin careke din ber bi ezmanan ve bifirin. Ji ber teyrikê Dodo jî digel ku teyrikekî pir mezin e, lê bê bask e û nikane bifire. Loma jî hin lêkolîner, Ferîşteyên sergumkirî û sêwirandina teyrikê Dodo yê li ser kêlberên Girêmiraza dirûberî ne.

## Hilberîna bîrayê û kevirê qul

Gorbihuştê Klaus Schmidt gotiye: "Wan mirovan, ji derdora çiyayê Qerejdaxê cehê bejî anîne û di zeviyan de çandine. Paşê jî, ji ava wî cehî bîra hilberandine. Wexta wan îbadet kiriye, bîra vexwarine. Piştî serxweş ketine, xwe di çemberа wî kevirê qul re derbas kirine. Bi vî awayî xwestine derbasî alemeke din bibin (yan jî derbasî alemeke din dibûn)" Herwiha gorbihuşt Klaus Schmidt pêde diçe û dibêje: "Ev sêwirandina teyrê Sîsalk jî, dibe ku Şamanên wan, ango şefên wan mirovên hingê bin, xwe xistibin vî qilixê teyrê Sîsalk û bi vî awayî rîtuelên xwe kiribin"

